## Xwedayên bêmaske û faşîzma dîjîtal

Dewleta netewe tevgereke şer a leşkerî û siyasî nîne ku mîna di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de tenê bi dewlet û çandên derketine pêş re têbikoşe. Li dijî tevahiya rêûresma civakî-dîrokî, her pêkhatina nû ya cihê ya hêviyê bide, ji bo paşerojê tevgereke şer a girseyî ya civakî... ***Kurdistan Lezgiyeva / R.7***



## Bi derewan rastî nayên veşartin

Kolonyalîzma ku di van du sedsalên dawî de li Kurdistanê hatiye jiyîn her tim bi heman taktîk û polîtîkayan pêşketiye. Bi rê û rêbazên cûda hertim hatiye xwestin ku polîtîkayên dewletên mêtinger li ser civakê ferz bikin. Helbet, sîstem jî wisa difikire ku vî awayî encamên girîng... ***Felemez Ulug / R.6***




# xwebûn

22-28 MIJDAR 2021 HEJMAR: 101 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Têkoşîn bi jinan geş dibe

Meha vejîna kurdan e mijdar; pira navbera demsala payîz û zivistanê ye. Tovê xewn û xeyalên jiyana azad di mijdarê de şîn bû. Jin bi hezaran sal in li dijî desthilatdariyê têdikoşin. Kurdên azad jî di dîroka 43 salên borî de bûne hêza hevsengiya têkoşîn, berxwedan û demokrasiya Rojhilata Navîn. 25'ê Mijdarê ji bo jinan û kurdan daneheva vejînê ye... ***Adar Şaman / R.2***



## Hêza têkoşînê ji hev digirin

Di dîrokê de li gelek deverên cîhanê çîrok û bûyerên li ser berxwedana jinan her çiqas ku hatin binaxkirin jî yên tim bûne wek destanekê jî hene. Ji çîroka jinên wek Rindêxan, Jeanne d'Arc, Fatareş heta serîhildana Leyla Xalîd, Leyla Qasim, Besê, Zîlan û xwişkên Mîrabelê jinan xeteke berxwedanê ava kir. Di encama berxwedana jinan de, roja ku Xwişkên Mîrabelê hatin qetilkirin, 25'ê Mijdarê ji hêla Neteweyên Yekbûyî ve wekî 'Roja Têkoşîna Li Hemberî Tundiya Li Ser Jinan' hat îlankirin. Helbet bi jinên li her deverên cîhanê tenê ne... ***Hevpeyvîna Bêrîvan Kayi / R.4***

## Çekên kîmyewî rewa dikin

Dewleta tirk, êrîşên xwe ji 23'yê nîsanê ve li Metîna, Avaşîn û Zapê didomîne. Artêşa tirk her çiqas bi çekên giran, balafiran û teknîkên pêşketî êrîşî axa Kurdistanê bike jî heta niha tu encam negirtiye. Wexta ku siyaseta tirkan tengav bibe û desthilatdariya wan neçar bimîne, dest bi siyaseta şerê qirêj dikin. Lewma artêşa tirk demek dirêje li ser axa Herêma Kurdistanê çekên kîmyewî bi kar tîne. Li gorî bîlançayo Navenda Çapemenî û Ragihandinê ya HPG'ê aşkera kiriye, dewleta tirk di 6 mehên dawiyê de zêdetirî 323 caran li dijî hêzên HPG'ê çekên... ***R.6***



## Kurdî Kurdistano Federal ra remenê

Heme civakan yew bi yew xo rizgar kerd, la kurd nêeşkayî xo rizgar bikerê. Zaf sebebî estbî, la nê sebeban ra di hebî zaf muhîm bî. Yew, çinbîyayîşê tîfaqê neteweyî, o bînî zî yewbîyayîşê dînê ma û yê tirkan o. Seke ma heme zanê şaro tirk aîdê Anatolya û Mezopotamya nîyo. Asyaya mîyanine ra ameyo û bi sayê hetkarîya kurdan badê şerê Melezgîrî yê 1071î Anatolya de bi ca... ***Mehmet Şahîn / R.9***

BÊRÎVAN KARATORAK

### Li Dêrsimê nebateke bitehm û feyde: Sîr... ***R.12***

HESEN HEMKÊ

### Mamoste xwendekar û xweza... ***R.10***

## Li eniya rojava guhertin tune ye

Yê sosyal demokrat dibêje ez ê Qendîlê hilweşînim. Yê sosyalîst kurdan li gorî xwe dike du beş. Yê faşîst Kurdistanê tune dihesibîne. Şefê mezin li pey qirkirinên nû ye. Aborînasê wan kurdan dişibîne neynûkê. Dîroknasê wan hêj di nav hewldana tirkkirina kurdan de ye. Stranbêja wan di bernameya zindî de alaya tirkî dide destê yekî kurd û dibêje 'bêje ez kurd im'. Mafyayê wan behsa ew qas qirêjiyan dike lê ji bo îşkence û wahşeta li ser kurdan kiriye yek gotinê jî nabêje. Akademîsyenekî ji ber gotina 'Kurdistan' diavêjin zîndanê. Lê şefê mezin li Êlihê... ***Zinar Ronî / R.8***

## Ya Star

Wa diyar e, gotinên req û qor yên em bi kar tînin, hew zêde bi kêr tên. Her wiha di van demên dawî de, niviskarên kurd hin gotin û têgehan dixin rojeva kurdan, der heqê etîk, moral û estetîkê de dinivîsin. Di kanalên TV'yên kurdan de ev mijar têne axaftin. Aqûbet li serê meydana siyasî jî be! Hûn dizanin bê kengî hikumet û genaralan li hev kirin û ji sermayeya (kapîtal) "kesk" û "şîn" re deriyên Tirkiyeyê vekirin. Bi alayên "açilim"an... ***Seyidxan Anter / R.5***



## Dayik li qadan têdikoşin

Çalakiyên dayik û malbatan ên li dijî tecrîda Îmraliye, zextên li ser girtiyan, nedayîna cenazeyan, her ku diçe belav dibin. Çalakiya li Sêmalka di roja 49'an, çalakiya Emîne Şenyaşar di roja 259'an de... ***R.3***

## Çîroka xiyanetê

Min ew di daweteke gundê me de nas kir û çavên me bi çavên hev ketin, em bûn evîndarên hev û piştre jî em bi hev re zewicîn... Û pênc zarokên me çêbûn. Heta roja ku ket destê çeteyên DAIŞ'ê jî em evîndarê giyana hev bûn. Rojekê wî dilê min neêşand û di hemû jiyana xwe de ji min re gelek baş bû. Lê bêbextiya felekê, dewletên komploger bi hevkariya PDK'ê di fermana 3'yê Tebaxa 2014'an de, çeteyên DAIŞ'ê bera pêsîra gulistana Şengala mala kurdî dan û bi destê qelereşên çeteyên hov ên DAIŞ'ê Heyderê min dîl hat girtin û pişre jî ligel komeke mêrên êzidî hatin şehîdxistin... Wî gelek baweriya xwe li pêşmergên PDK'ê anîbû, heta kêliya dawî jî digot 'wê pêşmerge me biparêzin, ez Şengalê û gundê Gir Zerkê naterkînim û bi we re nayêm.'... ***Leyla Lorîn / R.2***

# Ji bo jinan her roj 25'ê Mijdarê ye



Adar Şaman




Meha vejîna kurdan e mijdar; pira navbera demsala payîz û zivistanê ye. Tovê xewn û xeyalên jiyana azad di mijdarê de şîn bû. Kurd di dîroka 43 salên borî de bûne hêza hevsengiya têkoşîn, berxwedan û demokrasiya Rojhilata Navîn. Vîna hizrî ya veguhertinê, bû sedem ku lêgerînên azadiyê geş bibin. Mijdar, daneheva vejînê ya ruhê kurdên azad e.

Jinên kurd ji aliyekî ve, ji bo 25'ê Mijdarê di nav hewldanên plansaziya mezinkirina têkoşînê de zend û bendê xwe badan, ji hêla din ve bi coşek mezin amadekariya roja şahiyê ya vejîna azadiyê dikin. Jinan, li tax, kolan-kuçe, gund, navçe û bajarên bakur, rojava, rojhilat û başûrê Kurdistanê, bi rêxistinkirina komcivîn, çalakî, semîner, atolye û mîtîngan starta 25'ê Mijdarê ya Roja Têkoşîna Dijî Tundiya li ser Jinan a Cîhanê dan. Ji bo pêşwazîkirina 25'ê Mijdarê gotûbêj tên pêşxistin. Asoya kar û xebatê ya sala borî û têkoşîna li dijî kotekî/tundûtujiya mêrdewletê rave dikin. Jin ji destpêka vê mehê ve di nav hewldanên karîger de têdikoşin, ji kujêrên jinan hesap dipirsin; dewa mafên xwe yên hiqûqî û siyasî dikin.

**Dema jin bixwazin**

Dema ku jin bixwazin, qad, kuçekolan û peyarê yên wan in. Li çar kenarê cîhanê, jin di nav lêgerînên pêşwazîkirina roja têkoşîna tundûtujiya li dijî jinan a cîhanê de ne. Ahenga rêbaza têkoşîna jinan a vê salê, ji salên borî hîn bi coştir e. Ya esas coşa heyî dema tevî hûrguliyên jiyanê dibe, di rûyê her jinek ku ji bo mafê xwe têdikoş de dibe hêviya wêrekiyê. Jin, bi hêviyên xwe mezin dibin. Biryara mezinkirina destketiyên jinan ên di asta dinyayê de, êdî ji bo her jineke bûye prensîba jiyanê.

Di sedsala 21'emîn de çareserî ji paradîgmaya serdest a moderniteya kapîtalîst hêvîkirin, bêçaretî, xafletî û şaşîtiya herî mezin a dîrokê ye. Bingeha hemû xirabî û qeyranên ku çavkaniya wan pergala patriarkale, tekane rêya ji van krîzan xilasbûn mezinkirina alternatîfên têkoşîna yekgirtî ya di asta gerdûnî de tê kirin, pêşdebirina wê ye. Qadên aîdî jinan, bi têkoşînê tê avakirin. Jinên kurd, bi pêşengiya paradîgmaya 'civaka demokratîk, ekolojîk û azadiya jinan re' her roj li qadên têkoşîne; li dijî qirkirina jin û jiyanê rêxistina xweser mezin dikin. Şerê vê serdemê yê herî bi xirecir ku em jê re 'nakokiya zayîndî' dibêjin bandora xwe li siyaseta navendî ya pergala cîhanê jî dike. Jin li hemberî peradîgmaya navendî, desthilatdariyê di nava şereke cur bi cur de têdikoşin.

**Divê têkoşîn ne demkî be**

Desthilatdar li gorî berjiwendiyên xwe, her carê ji bo parastina temenê xwe, qeyranên nû yên bêsebeb ên pûç dixe rojeva civakê. Hewldana wî ew e ku civakê mîna termê mirarbûyî bêruh, bêmejî û bêvîn bike. Loma ev ne gengaz e, diyalektîka hizrandina civakê xwedî bîr û baweriyek kûr a ji dîrokê digire heye.

Lazim e têkoşîna di pêşengiya jinan de tê gurkirin, ne ji bo rizgarkirina pergala mêr-serwer û desthilatdariyê ji krîzên heyî rizgar bike bê dayîn; divê bo bidawîkirina îktîdarê, têkoşîn bê mezinkirin. Jin dikarin bi kar, xebat û hêza xwe ya rêxistinbûyî pergala li dijî vîna wan hatiye sazkirin bêkêr bikin. Civakê ji jêr serweriya pergala bav-dewlet-serweriyê xilas bikin û hêza xwe ya civakbûnê mezintirîn bikin.

**Her roj berxwedan û raperîn**

Kotekî/tundûtujiya dijî jinan tê kirin êdî meseleyek wisa ye ku sînorên welat û herêman derbas kiriye. Ev kotekiya ku dijî neteweya jinan tê kirin, ne mimkun e ku bi têkoşîna rojêke ji holê be rakirin. Ji bo ku her cureyên tundiyê yên dijî jinan bê rawestandin/şikandin, pêdivî bi têkoşînek dayîmî ya domdar heye. Bi têkoşîna rojekê, azadî pêk nayê! Tundûtujî, qirkirin, destavêtin û xizanî ne qedera jinan e.

Êdî ew kêliya ku jin li dijî kotekiya mêr-dewletê biherikin qadan û gotinên xwe bêjin hatiye. Divê di serî de desthilat, mêr, gotinên jinan ên derbarê vê roja têkoşînê de têne kirin, bixin guhar û bi guhê xwe ve bikin; hurmetê raber têkoşîna jinan bidin. Lewma ji bo jinan, her roj 25'ê Mijdarê ye. Her roj roja têkoşîn, berxwedan û raperînê ye.

## Şoreşa jinan çima tê dizîn?

Zêdetir divê em jinên kurd, ji dîroka jinên cîhanê yên têkoşer, sosyalîst ezmûn derxin. Em ji dîroka şoreşên dinyayê hîn dibin ku jinan bi her awayî pêşengiya şoreşên civakî yên di dîroka gelan de pêkhatine kirine û di hemû karan de xwedî rol û erk bûne. Lê piştî avakirina şoreşê em dizanin ku pêşengiya jinan dikeve plana duyem. Rol û erka jinan a di şoreşê de tê lewazkirin û keda wê tê dizîn. Vegera jinan a rolên kevneşopî, piştî avakirina her şoreşê, pêk hatiye. Ev ji bo me jinan mijara lêpirsîn û vekolînê ye. Şoreşa jinan çima tê dizîn? Rê li ber jinan hatiye girtin û mejiyê şoreşê bi nêrîna zilam hatiye birêvebirin. Cewhera şoreşan, bi siyaseta mêrdewletê araste bûye. Ji ber wê yekê şoreşên gelan ên cîhanê yên mezin ên pêkhatî tu carî nebûne mekanên ku vîna jinan têde azad bibe. Temsîl, gotin û biryarên şoreşê aîde mêran tên dîtin.

# Çîroka xiyanetê



Leyla Lorîn

Min ew di daweteke gundê me de nas kir û çavên me bi çavên hev ketin, em bûn evîndarên hev û piştre jî em bi hev re zewicîn... Û pênc zarokên me çêbûn. Heta roja ku ket destê çeteyên DAIŞ'ê jî em evîndarê giyana hev bûn. Rojekê wî dilê min neêşand û di hemû jiyana xwe de ji min re gelek baş bû. Lê bêbextiya felekê, dewletên kompleger bi hevkariya PDK'ê di fermana 3'yê Tebaxa 2014'an de, çeteyên DAIŞ'ê bera pêsîra gulistana Şengala mala kurdî dan û bi destê qelereşên çeteyên hov ên DAIŞ'ê Heyderê min dîl hat girtin û pişre jî ligel komeke mêrên êzidî hatin şehîdxistin...

Wî gelek baweriya xwe li pêşmergên PDK'ê anîbû, heta kêliya dawî jî digot 'wê pêşmerge me biparêzin, ez Şengalê û gundê Gir Zerkê naterkînim û bi we re nayêm.' Neviya min a biçûk Rihanê her çendî destê bavê xwe dikişand jî lê tevî wan hewldananên wê, ew ji cihê xwe ranebû, bi ser de jî bangî min dikir û digot 'hûn jî neçin, wê pêşperge me biparêzin.' Di guhê min de ew gotina wî ya dawî bû. Piştî wê kêliyê êdî min qet dengê wî nebihîst!

**Şopên çîrokên jinên êzidî**

Em carek din ji bo pirtûkxaneya Rojnameya Xwebûnê li pey şopên çîrokên jinên êzidî yên Şengalê ketine rêyek dûr. Li gundê Gir Zerkê yê Şengalê, bûne mêvanê dayika Gewrê Xelef. Dayika Gewrê li ser vê axa bereket temeneke bi êş jiyaye. Me ew seat di çarê berbanga sibehê de li ser nimêjê zevt kiribû. Di ola Êzdayetiyê de nimêja rojê, çanda kurdan a kevnar e. Çimkî çand û baweriya kurdan a qadîm, çanda Êzdayetiyê de hîn jî heye.

Ez û hevalê xwe yê rojnemevan Yaser, ber bi dayê ve diçin, ew jî bi dileke germ û bi rûkenî silava me vedigerîne û cihê rûniştinê nîşanî me dide. Piştî kêliyeke rûniştinê, em hema meraqa dilê xwe jê re dibêjim; "Dayê te di nimêja xwe de çi lave û daxwaz ji roja me re kir?" Dayê Gewrê bi kesereke bêhn lê çikayî û xemgîn ji nava kezeba dilê xwe kişand û hîn zêdetir xwe nêzî min kir û got: "Ez her roj berbanga sibehê radibim, ji bo dîlên êzidiyan ên ku di destê çeteyên DAIŞ'ê de mane lave dikim. Di lavên xwe de dibêjim, kesên ev fermana reş bera pêsîra civaka êzidiyan dayî mala wan wêran bibe. Xwedê mala PDK'ê bi ser wan de xopan bike."

Dayê Gewrê Xelef girêdayî bajarê Şengalê li gundê Gir Zerkê di sala 1951'an de ji dayik dibe. Bajarê Şengalê, li qiraxa Çiyayê Şengalê hatiye avakirin; aliyekî wî dikeve deştê, aliyekî wî jî pala xwe dide çiyayê Şengalê. Şengal di nav deşta erebî de weke baxçeyeke gulan ên kurdî diyar dibe. Di fermana 3'yê Tebaxa 2014'an dayê Gewrê 66 saliya xwe tevî sê bûk û neviya xwe, çeteyên DAIŞ'ê wan dîl digirin û nêzî deh caran serçeteyên DAIŞ'ê dayê Gewrê ji bo xizmeta mala xwe difiroşin hev...



**Tirs û xof serdest bûn**

Piştî ku em kurteçîroka dayê Gewrê guhdar dikin, bi rûyeke beşişî, bi kesereke xemgîn û bi çavên hêvî ji wan dibare ji me re qala çîroka xwe dike û wiha dibêje: "Şeveke tarî bû û tu kes hevdu ji nêz ve jî nedidît. Hilma germahiya havînê li ser şevê ketibû, tirs û xof serdest bû. Tirseke mezin ketibû ber her deriyê malên êzidî. Vê tirsê pêşiya hewara Melekê Tawis jî girtibû. Ez li ser cihê xwe nenivîstibûm, çavên min vekirîbûn. Bêhn li min çikiyabû, min qet nedikarî hilmê jî bistînim. Weke 100 mirov ji min re bibêje ka rabe; bi rabûna min re, ji nişkan ve deng bi çekan ket!...

**Sehwa mirinê...**

Heyder serê xwe ji nav nivîna xwe rakir û got 'netirsin pêşmerge çekên xwe diceribînin, ew ê me biparêzin.' Lê belê em çi bibînin, heta berbanga sibehê mirov weke kerî ketin pê hev û bû qîreqîra wan. Qîrîna mirovan li ber erşê ezmanan olan dida. Zarok di ber pêsîrên dayikên xwe de dinalîn, qîr û hewara xelkê bû. Hewara dayikan tarîtiya şevê diçirand. Di wê şevê de du pîremêrên çeteyên DAIŞ'ê em nêzî hezar mirovî zêdetir kom kirin û ji me re gotin, her yek ji we paçeke spî bixin destê xwe û em ê piştre we bibin malên we..."

Hîn dayê Gewrê gotinên xwe neqedandibû, carek din ez ketim navbera gotinên wê û min jê pirsî: "Ma çeteyên DAIŞ'ê tenê du pîremêr bûn? Ma hûn çend kes bûn? Ma gelo qet kesên ku xwedî cesaret be û destwerdanê bike di nav hezar kesan de tune bû?"

Dayê Gewrê carek din kesera xwe kişand û bi berdewamî got: "Sehwa mirinê ketibû dilê me herkesî û çok û qudûmê me tevan şikestibûn. Kesekî ji tirsa nedikarî henase bêhnê bistîne. Mala wan bişewite û agir bi mala wan bikeve. Dê li ewladên xwe nedibû xwedî lawo!"

**Di bêdengiya şeva reş de**

Dayê Gewrê bêrawestan gotinên xwe wiha didomîne: "Piştî em li qamyonan siwar kirin, her sê bûkên min û neviya min Rihanê jî li wê qamyonê siwar kirin. Em birin Teleferê, piştî çend seatan em li Teleferê man, di wan çend seatan de hinek çeteyên din jî hatin wir. Ew kesên hatin, erebî, tirkî û biyanî bi hev re diaxivîn. Carek din em li qamyonan siwar kirin û em birin zindana Badûşa... Zindana Badûşa di navbera Teleferê û Şengalê de bû. Xortên me yên ciwan hemû kirin wê zindanê. Me li ser jiyana wan tiştek nedizanî, tu kesan ji tirsa nedikarî ewlad û zarokên xwe jî pirs bike. Wê şevê em li zindana Badûşayê man. Ji tirsan kesek nedikarî xew bike. Di bêdengiya wê şeva reş de, du çeteyên rih dirêj, hatin du keçên 18 salî birin! Dema ew jinên ciwan birin agir ket nava kezeba min de. Dilê hinek dayikan tavilê di wê kêliyê de sekinîn. Lê kesekî ne dikarî ji tirsan dengê xwe derbixe. Tenê qîre-qîra wan herdu keçên bedew ên di nava lepên gurên har de me dibihîst û em bêçare bûn..."

***(dê bidome)***

# Dayik li dijî tecrîdê berxwedanê mezin dikin

**Dayikên kurd li Riha, Sêmalka, Amed û Stenbolê li dijî polîtîkayên şer, tecrîd û tundiya li ser girtiyan li qadan têdikoşin. Dayik li qadan li dijî şer, ji bo aştî û yekîtiyê li ber xwe didin**

Navenda Nûçeyan

Çalakiya konvedanê ya li deriyê Sêmalkayê ya bi daxwaza cenazeyên gerîla Tolhildan Raman û Serdem Cûdî yên ku li herêma Xelîlfanê di kemîna hêzên PDK'ê de jiyana xwe ji dest dan di roja 49'an de berdewam dike. Her roj sazî û rêxistinên cuda bi girseyî serdana kon dikin û piştgiriyê didin malbatan. Malbatên girtiyên nexweş jî ji 16'ê mijdarê ve li Baroya Amedê dest bi "Nobeta Edaletê" kirine. Herî dawî li Stenbolê dayik daketin qadan û bertekên xwe anîn ziman.

**Dayik li dijî şer azadiyê dixwazin**

Înîsiyatîfa Dayikên Aştiyê ya Stenbolê bi dirûşmeya "Dayik li dijî şer û tundiyê, aştî û azadiyê dixwazin" li pêş avahiya Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ya Navçeya Kuçukçekmeceyê kom bûn. Akitîvîstên TJA'yê, Hevseroka Rêxistina HDP'ê ya Kuçukçekmeceyê Gulsum Ozturk û gelek jin beşdarî çalakiya dayikan bûn. Jin, ligel astengiya polîsan jî ji avahiya HDP'ê heta gola Kuçukçekmeceyê meşiyan. Jinan di meşê de dowîzên "Girtina girtiyên nexweş neheqî ye" , "Ne şer û tundî, aştî û azadî", "Dayik li dijî şer berxwedanê mezin dikin" , "Tecrîd şer kûr dike" hilgirtin û dirûşmeyên "Jin şer naxwazin" , "Em dayik in bi aştiyê re ne" û "Jin jiyan azadî" berz kirin. Li ser navê Dayikên Aştiyê Bedîa Gokguz bikaranîna çekên kîmyewî yên Tirkiyeyê bi bîr xist û diyar kir ku ji bo li dijî şer aştiyê biparêzin hatine gel hev. Gokguz, anî ziman ku tundiya li ser jinê jî qebûl nakin û wiha got: "Sedemê van komkujiyan polîtîkayên şer ên desthilatê ne. Em jin van polîtîkayan şermezar dikin. Sedema ev şerê qirêj pergal û desthilatî ye. Dibêjin 'ji malên xwe dernekevin û ji gotina zilaman dernekevin'. Bila dest ji ev zimanê qirêj û mêrane berdin. Sedemê herî mezin a vev tundiya şerê qirêj e. Heke şer bi dawî bibe wê tundî jî bi dawî bibe. Em êdî şer naxwazin. Em dayik in hûn ji laçika me ya spî ditirsin? Bes e."




# 'Nobeda Edaletê' û banga hevgirtinê

Navenda Nûçeyan

Bi dehan salan e ku dewlet û hikumeta ku Tirkiyeyê bi rê ve dibe li ser kurdan hemû polîtîkayên dijmirovî ceribandin. Heta niha rêbazên kuştin, girtin, qirkirin, talan û wêrankirin li dijî kurdan hatine ceribandin. Kurdên li ber xwe dan, teslîm nebûn. Hertim hewl dan li ser rûyê erdê û binê erdê, li derve û zindanan xwestin kurd bêstar bihêlin. Ev dijminantî û hovîtiya ku meşandin rastî vîneke ji pola ya kurdên berxwedêr hat. Wekî çek an jî amûra bûmerangê lê vegeriya û bû sedema têkçûyîna dewlet û desthilatiya ku bi rê ve dibe.

Dewleta tirk a ku li dijî berxwedana kurdan bi ser nakeve, tola xwe ji kurdên ku hatine dîlgirtin digire. Bi salan e ku li zindanan îşkenceyeke mezin pêk tîne. Di serî de li Grava Îmraliyê li dijî Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan tecrîdeke giran pêk tîne û di şexsê Ocalan de li tevahiya zindanên li Tirkiye û Kurdistanê îşkenceyeke giran li ser girtiyên kurd pêş dixe. Li zindanan binêkirinên mafan derketiye lûtkeya herî jor. Bi taybetî jî îşkenceya li ser girtiyên nexweş tê kirin êdî sînorê sebrê derbas dike. Li gorî daneyên Komeleya Mafên Mirovan ÎHD'ê li zindanên Tirkiye û bakurê Kurdistanê hezar û 604 girtiyên nexweş hene, ji van 605 girtî rewşa wan giran e. Nikarin di zindanan de bimînin û divê demildest bêne berdan. Lê dewlet ne berdide, ne jî derman dike. Li dijî vê rewşê di 16'ê mijdarê de xizmên girtiyên nexweş ji bo balê bikişînin ser rewşa xêzmên xwe li Baroya Amedê dest bi "Nobeda Edaletê" kirin. Nobeta xizmên girtiyan didome.

Bêguman nepêkan e ku mirov lîsteyeke ew qas dirêj a girtiyên nexweş li vê derê rêz bike. Lê malbatên ku niha dest bi çalakiyê kirine, malbata Sidik Guler, Mehmet Emîn Ozkan, Ahmet Kolakan, Abdulselam Guler û Ciwan Boltan e. Armanca xizmên girtiyan jî ew e ku demildest bên berdan û li derve bêne dermankirin. Ji ketina nav hûrgiliyan wêdetir tenê tabloya, temen û salên dirêj ên zindanîbûyînê bi xwe jî xofekê dixe dilê mirov. Girtiyê nexweş Sidik Guler 83 salî ye ku 26 sal in girtî ye û niha li Girtîgeha Îskenderûnê dimîne. Mehmet Emîn Ozkan ê 83 salî, 26 sal in girtiye û niha li Girtîgeha Tîpa D a Amedê dimîn e. Ahmet Kolakan 28 sal in girtî ye û niha li Girtîgeha Bandirmayê ye. Abdulselam Guler ev 28 sal in girtî ye û niha li Girtîgeha Tîpa D a Amedê dimîne. Ciwan Boltan ev 9 salin girtî ye û niha li Girtîgeha Tîpa F a Bolûyê dimîne. Ev temenê dirêj û salên dirêj hertiştî radixe ber çavan.



**Banga mezinkirina çalakiyê**

Daxwazên hemû malbatan jî ew e ku dawî li vê zilmê bê, edalet serwer bibe, binpêkirinên mafan bi dawî bibe û xizmên wan bên berdan. Malbat di çalakiya xwe de bi israr in. Her wiha roj bi roj malbatên nû tevlî vê çalakiya "Nobeta Edaletê" dibin. Her roja çalakî dibe rojev. Serdan û piştgiriya ji bo malbatan jî zêde dibe. Xizmên girtiyên nexweş dibêjin; "Em mafdarin, çalakiya me rewa ye û em ê bi ser bikevin." Malbat bang dikin û dibêjin; "Divê hemû malbat û xizmên girtiyên nexweş û girtiyên ku cezayên xwe qedandine nayên berdan li bajarê ku lê dijî dest bi çalakiyan bikin. Piştgiriyê bidin çalakiya me." Banga mezinkirina çalakiyan dikin. Dixwazin li her bajarî çalakiyên wiha pêş bikevin.

Tişta xuya dibe berxwedan û serînetewandina malbatan a bi salan a li dijî zilm, hovitî û îşkenceyê. Di esasê xwe de ev çalakiya "Nobeda Edaletê" banga hevgirtin û bilindkirina têkoşîna li dijî îşkence û tecrîdê ye.

# MED TUHAD-FED: Li hemû girtîgehan sirgûnkirin zêde kirine

Navenda Nûçeyan

Rêvebera MED TUHAD-FED'ê Sunay Aslan bal kişand ser rewşa girtîgehan û wiha got: "Bi taybetî di saleke dawî de bi hinceta şewba vîrûsa coronayê li hemû girtîgehan binpêkirina mafan zêde bûye.

Aslan, diyar kir ku di salek dawî de li hemû girtîgehan sirgûn zêde bûye û wiha got: "Di salek dawî de li gelek girtîgehan girtiyan sirgûn dikin. Di meha borî de malbatan serî li federasyona me dan û diyar kirin ku hemû girtiyên li Kirikkaleyê sirgûn kirine. Dema girtî sirgûn kirin, hemû girtî bi tundiyê re rû bi rû man. Dema girtiyan sirgûn dikin hemû alav û amûrên wan ên taybet desteser dikin. "

**Bi ser qawîşan de digirin**

Aslan, da zanîn ku girtiyên têne sirgûnkirin, li girtîgehên nû bêtir bi zext û tundiyan re rû bi rû dimînin û wiha got: "Piştî pandemî zêde bû, girtiyên li girtîgehên dûrî malbatên xwe dimînin, berî her tiştî dixwazin sewqî girtîgehên li nêzî malbatên xwe bêne kirin. Girtî daxwaznameyan didin. Lê bi hinceta pandemiyê bersivên erênî nadin girtiyan. Li dijî girtiyan cotstandartî heye. Bêyî daxwaz û agahiya girtiyan wan sewqî girtîgehên din dikin. Di meha borî de giştînameyek ji hemû girtîgehan re hat şandin. Piştî vê giştînameyê, gardiyan û leşkeran bi hev re bi ser qawişên girtiyan de girtin."

**Qawîşên girtiyan diguherînin**

Aslan, anî ziman ku ji adara 2020'an heta niha bi hinceta şewba corona gelek girtî ji mafên xwe yên xwezayî û zagonî bêpar têne hiştin û wiha lê zêde kir: "Bi hinceta pandemiyê mafê girtiyan binpê dikin. Şertên pandemiyê li ber çavan nagirin. Piştî giştînameyê, hemû girtiyan ji qawîşê wan vala dikin û dişînin qawîşên din. Girtiyên ku ji dozên cuda girtî ne, wan di navbera qawîşên girtiyên siyasî de bi cih dikin."

**Ava germ nadin girtiyan**

Sunay Aslan, bal kişand ser şertên girtîgeha Patnosê jî û wiha got: "Bi salan e li girtîgeha Patnosê pêkanînên dijmirovahî heye. Maf û pêdiviyên herî mirovî û zagonî nadin girtiyan. Behn ava vexwarinê tê. Xwarin nayê xwarin. Di nava xwarinê de madeyên plastîk heye. Bi tu awayî ava germ nadin girtiyan. Daxwaznameyên girtiyan li ber çavan nagirin. Mafê girtiyan ên jiyanî binpê dikin. Dixwazin pergala tecrîda li Îmraliyê pêş xistin, li hemû girtîgehan belav bikin. Ji ber polîtîkayên dewletê destûr nadin ku girtî ji mafên xwe yên hiqûqî, zagonî û mirovî sûdê bigirin. Mafê hevdîtina vekirî nadin girtiyan. Girtî di tecrîda di nava tecrîdê de dijîn. Bi hinceta pandemiyê mafê hevdîtinê ji destê wan hatiye girtin û li ser girtiyan tecrîdê pêş dixin.

Em bang li hemû malbatan dikin ku li dijî van binpêkirinên mafan û bêhiqûqiyê li cem girtiyan cih bigirin. Em ê her tim şopdarên daxwazên girtiyan bin û ji bo daxwaza wan pêk bê em ê têbikoşin. Em wekî komele malbatan di aliyê mafê hiqûqî de agahdar dikin. Têkildarî mafê hiqûqî em panelan pêk tînin. Ev xebatên me yên panelan dê bidomin.

## Civînên 'Dema Azadiyê' didomin

Civînên Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) û Tevgera Jinên Azad (TJA) yên "Dema Azadiyê ye" didomin. Rêveberên KCD, DBP û TJA'yê li Sêrt û Colemêrgê civînên gel li dar xistin. Rêxistina Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ya Sêrt, Misirc û Colemêrgê bi gel re civîn li dar xistin. Li Sêrt û navçeya Misircê Hevserokê KCD Berdan Ozturk û Hevserokê DBP'ê Keskîn Bayindir beşdarî civînê bûn. Li Colemêrgê jî Hevseroka DBP'ê Salîha Aydenîz, parlamenterên HDP'ê û aktîvîstên TJA'yê amade bûn. Beşdaran di civînan de pankartên "Tecrîd sûcê mirovahiyê ye, tecrîdê bi dawî bikin, ji bo jiyanê edalet " û "Em ê tecrîdê bişkînin, yekîtiya neteweyî pêk bînin" daliqandin. Hevserokê Giştî yê DBP'ê Keskîn Bayindir politikayên AKP'ê rexne kirin û got: "Heger kesek bixwaze pirsgirêka kurd çareser bike, beriya her tiştî divê tecrîda li ser Ocalan bi dawî bibe. Heger nekin, divê bê zanîn ku kurd tên xapandin. Gel dixwaze tecrîda li ser Ocalan bê rakirin. Em jî ji bo rakirina tecrîdê divê li gund, tax, bajarok, navçe û bajaran ango li her qadên jiyanê têkoşîna xwe mezintir bikin. Sebra gelê kurd û dostên wan li hemberî tecrîdê nemaye."

Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk jî bal kişand ser tecrîdê û got: "Gelê kurd niha di nava tecrîdê de ye. Tecrîda li Îmraliyê dest pê kir û li hemû qadên jiyanê belav bûye. Kurd vê yekê qebûl nakin. Em dizanin ku yek ji armanca tecrîda li ser Ocalan dûrxistina gelê kurd ji felsefeya Ocalan e. Ne tenê kurd, hemû gelên cîhanê di bin tecrîdê de ne. Tu xeber ji Ocalan nîne. Ev rewşek pir cidî ye. Cîhan ji bo azadiya Ocalan têdikoşe. Heger jiyana azad tê xwestin divê tecrîd bê rakirin. Dê hemû beşên civakê li dijî tecrîdê rabin." ***SÊRT***

## JINAN ÇANDEKE BERXWEDANÊ AVA KIR

# Îlhama têkoşînê ji hev digirin

■ Bêrîvan Kayi

*Di dîrokê de li gelek deverên cîhanê çîrok û bûyerên li ser berxwedana jinan her çiqas ku hatin binaxkirin jî yên tim bûne wek destanekê jî hene. Ji çîroka jinên wek Rindêxan, Jeanne d'Arc, Fatareş heta serîhildana Leyla Xalîd, Leyla Qasim, Besê, Zîlan û xwişkên Mîrabelê jinan xeteke berxwedanê ava kir. Di encama berxwedana jinan de, roja ku Xwişkên Mîrabelê hatin qetilkirin, 25'ê Mijdarê ji hêla Neteweyên Yekbûyî ve wekî 'Roja Têkoşîna Li Hemberî Tundiya Li Ser Jinan' hat îlankirin. Helbet bi jinên li her deverên cîhanê tenê ne di vê rojê de her dem li hemberî hişmendiya mêrsalar li ber xwe dan û hê jî li Rojava, Afganistan, Amerîkaya Başûr û li gelek deverên cîhanê li ber xwe didin. Der barê tundî û berxwedana jinan de em bi Parêzer Berfîn Polat a ku di Lijneya Komeleya Rosayê de kar û xebatên xwe didomîne re axivîn.*

**Gelo tu dikarî behsa xebatên Rosayê yên li hemberî tundiyê bikî. Rosa çi wextî û li ser kîjan armancê hat damezirandin?**

Wek hûn jî dizanin komeleya me piştî pêvajoya OHAL'ê hat damezirandin. Ji ber ku di wê pêvajoyê de hemû saziyên sivîl û saziyên şaredariyan ên li hemberî tundiya jinan li ber xwe didan, tev hatibûn girtin. Gelek qadên saziyên sivîl hatibûn girtin û qedexekirin. Li ser vê yekê jî pileya tundiyê bi taybetî li Kurdistanê her diçû bilindtir dibû, polîtîkayên çewisandin û tunehesibandinê zêdetir dibû. Em jî li hemberî vê yekê ketin nav liv û tevgerekê û me Komeleya Rosayê vekir. Armanca me sekna li hemberî van polîtîkayên dewletê yên ku jinan tune dihesiband bû. Bi damezirandinê re ji Amed û derdora wê gelek jinên ku rastî tundî û neheqiyan dihatin, serî li komeleya me dixistin. Ya rastî armanca damezirandina Rosayê di serî de ne ev yek bû. Lê me dît ku gelek kesan serî li komeleyê xistin me serî li hin saziyên jinan ên ji bo jinan li ber xwe didan xist û me bi hevdû re dest bi kar û xebatên xwe kir. Ev jî wek tora li hemberî tundiyê hat avakirin.

**Bi giştî jinên ku heta niha serî li komeleyê dixin, bi kîjan sedeman serî lê dixin? Piştî serîlêdanan pêvajoya hiqûqî çawa dişopînin?**

Sedemên serlêdanan piralî ne bi giştî. Gelek caran ew pêvajoyê hiqûqî tenê ji bo hin bûyeran em dişopînin. Her serlêdan jî ne bûyerên hiqûqî ne. Hin jin hene dixwazin desteka psîkolojîk bigirin, hin jin hene her çiqas ku rastî tundiyeke dijwar tên jî naxwazin pêvajoya hiqûqî dest pê bike. Naxwazin bi vê pêvajoyê re eleqedar bibin. Yanî em bi giştî li gorî daxwaz û xwestekên wan tevdigerin. Şopandina her serlêdana hiqûqî em nakin. Jinên ku rastî tundiyê tên em saziyên peywendîdar agahdar dikin û têkilî bi wan re datînin. Em hewl didin ku wan jî tev li van xebatan bikin. Tenê di rewşên awarte de em alîkariya hiqûqî didin. Ji bo zagona hejmara 6284 têkeve meriyetê em têdikoşin.

**Li Amedê we li dijî tundiya li ser jinan raporek amade kiriye?**

Em bi Tora Têkoşîna Tundiyê re dixebitin û raporên xwe jî bi wan re amade dikin. Saziyên wek SES, ÎHD, Baroya Amedê jî hevkarên me ne. Îsal em ê rapora xwe ya çaremîn biweşînin. Em di raporên xwe de tundiya dewletê jî bi awayeke berfireh teşhîr dikin û raporên me li ser înternetê jî tên weşandin.

**Gelo em dikarin bêjin piştî Peymana Stenbolê bûyerên tundiyê zêde bûn?**

Em rojane rastî çîrokên jinên ku hatine qetilkirin tên. Kiryarên heyî têrî têkoşîna li dijî tundiya jinan nake. Jin rojane ji hêla hevjîn, bav û birayên xwe ve tên qetilkirin. Piştî ku Peymana Stenbolê hat fesixkirin, di meha adarê de 19 jê biguman bi giştî 47, di meha nîsanê de 14 jê biguman 30, di meha gulanê de 20 jê biguman 37 , di meha hezîranê de 20 jê biguman 38, di meha tîrmehê de 12 jê biguman 32, di meha tebaxê de 21 jê biguman 52, di meha îlonê de 19 jê biguman bi giştî 45 jin hatin qetilkirin. Bêguman wexta ku mirov li van daneyan dinêre dikare bêje ku piştî peyman hat betalkirin hejmara jinên ku hatine qetilkirin zêde bûn. Her wiha ji ber ku jin baweriya xwe bi saziyên dewletê yên peywendîdar re naynin, di bûyêran de gilî nakin û serlêdanê nakin. Dewlet bi van polîtîkayên xwe jinan rast e rast bi qirkirinê re rû bi rû hiştiye.

**Li Tirkiye û Kurdistanê jinên ku serî li saziyên dewletê nadin gelo berê xwe dan saziyên jinan yan na?**

Jiholêrakirina Peymanê Stenbolê û pandemî di demên nêz de pêk hatin. Jin li malê bûn û ji ber metirsiya vîrûsê li dijî tundiyê gilî kirin jî li gorî demên berê hindiktir bûn. Bi pandemiyê re tundiya li ser jinan jî zêdetir bû. Her wiha rayedarên dewletê jî metirsî di nav jinan de belav kir. Ji aliyekî ve bi bandora şewba koronayê re jin di malan de bi tundiyê re rû bi rû man, ji aliyê din ve jî betalkirina Peymana Stenbolê tundî her çû zêdetir bû. Dewletê jî rewşa koronayê ji xwe re wek hincetê bi kar anî û hem saziyên jinan bêwate kirin hem jî peymana Stenbolê betal kir. Niha hatiye asteke wisa ku tu kes nikare peyva Peymana Stenbolê jî bi lêv bike. Yên ku qala peymanê dikin wekî sûcdar pênase dikin. Helbet ev atmosfer jî dike ku jin paş de gav biavêjin û jinên rastî tacîz û tecawizê tên jî bi tu awayî nebin gilîker. Jixwe li erdnîgariya em li dijîn, ji mahrumiyetê heta namûs, şermkirin, malbat, fikarên aboriyê û hwd. têra xwe kirin ku jin bi tundiyê re rû bi rû bimînin. Bi vê helwestê hewl didin ku ser vê tundiyê were girtin. Her çiqasî êrîş bi dijwarî tên meşandin jî li hemberî vê çandeke berxwedanê jî hatiye avakirin. Jin û saziyên jinan bi hevdû re li ber xwe didin, ev yek jî helbet mirov kêfxweştir dike. Lê hewceye ku mijarên wekî namûs, şermkirin û hwd. civak rast were serwextkirin. Ji ber vê çewtiyê bi dehan jin tên qetilkirin.



Tundî tenê bi awayekî fîzîkî pêk nayê, bi awayê zayendî, aborî, psîkolojîk û ji gelek aliyan ve pêk tê. Tundiya zayendî bi giştî xwedî armanceke ku jinan kontrol bike, biçûk bixe, kêm bibîne û wan ceza bike

**Ji bilî tundiya fîzîkî tu dikarî qala tundiya psîkolojîk bikî?**

Tundî çewisandin û tunehesibandina bi awayê fîzîkî, psîkolojîk, aborî û zayendî ye. Di van aliyan de zilmeke mezin li jinan tê kirin . Yanî azadiya jinan bi awayekî keyfî ji destên wan tê derxistin. Ji qadên cemaweriyê heta yên taybet jin bi her awayî bi awayekî keyfî tune tên hesibandin. Yanî bi giştî liv û tevgerên ku jinan tunedihesibînin tev em wek tundiyê pênase dikin. Tundî tenê bi awayekî fîzîkî pêk nayê, bi awayê zayendî, aborî, psîkolojîk û ji gelek aliyan ve pêk tê. Tundiya zayendî bi giştî xwedî armanceke ku jinan kontrol bike, biçûk bixe, kêm bibîne û wan ceza bike. Bi rê û rêbazên têkiliya zayendî hişmendiya serdest dixwaze jinan demoralîze bike, bêîrade bihêle û nahêle jin jî xwe bawer bikin. Mixabin îro bi hezaran jin bi vî awayî di nav malê de li ser navê zewacê rastî van cureyên tundiyê tên. Bi taybetî jinên zewacandî jî aliyê mêr ve rastî van bûyeran tê lê ev çewisandin wek tundiya nayê dîtin û ser vê yekê jî tê girtin, an jî nizanin ku ev tundî ye. Wek peywireke zewacê dihesibînin. Tundiya zayendî ligel tacîz, tecawizê, bi zorê ketine têkiliya zayendî jî tundî ye. Gelek jin jî ji aliyê bav, dergistî, bira û hwd. ve rastî vê tundiya psîkolojîk, aborî jî tên, lê serî li tu deverê nadin. Ew jî bi heman awayî wek tundiyê nabînin. Tundiya zayendî tundiya ku herî zêde li ser jinan tê ferzkirine lê ev yek ji ber gelek sedeman tê veşartin û jin bêdeng dimînin. Yanî gelek cureyên tundiya zayendî û psîkolojîk hene. Yek ji wê mînakê jî dosyeya Îpek Er e. Li hemberî vê yekê jî hewceye saziyên jinan dest bi xebatên ku jinan agahdar bikin, ji bo jinên zewacandî jî hewceye atolye werin çêkirin û em jinan di van mijaran de agahdar bikin. Yanî hewceye em tundiya zayendî jî wekî ya fîzîkî û psîkolojîk bibînin û jinan di van mijaran de agahdar û hişyar bikin.


**Gelo li Kurdistanê polîtîkayên li ser jinan ên tundiyê çi ne, li ser wan çi tê ferzkirin?**

Jiyîna jinan a li vî welatî bi serê xwe pir zor û zehmet e. Ligel nasnameya jinan dema nasnemeya kurdbûnê jî lê zêde dibe wê demê tundî hêj zêdetir dibe û rewş girantir dibe. Me ev yek di mînaka Îpek Er, Gulistan Doku de jî dît ku jî aliyên kesên bi unîforme, personel, peywirdar û çawişên pispor ve rastî tecawiz û qetilkirinê tên. Li hemberî jinên kurd ên ciwan bi navê 'têkiliyên hestiyarî' jin tên tacîz û tecawizkirin, tên bêîradekirin û qetilkirin. Lê ev kes ji ber ku endamên dewleta tirk in bi her awayî tên parastin û nayên darizandin, bêceza dimînin.

Ligel vê yekê jî jinên kurd ên ku ji bo wekhevî û azadiya jinan li ber xwe didan ên wek Ayşe Gokkan û bi dehan jinên din îro tên binçavkirn û girtin, Îradeya wan tê xespkirin. Jixwe di dema OHAL'ê de jî dîsa dewletê êrîşî pergala hevserokatiyê kir bi qeyûman ev temsiliyeta wekheviyê ji holê rakir. Van qeyûman jî di qevza xwe ya yekem de saziyên jinan ji holê rakirin, girtin. Dema tu wekî jinekî li ber xwe bidî divê ku gelek kes li kêleka mirov li ber xwe bidin, lê dema tu wek jineke kurd li ber xwe didî ew kesên berê ligel te bûn, êdî dibin dijberê te. Tundiyeke ku tenê ne li ser zayendê, li ser ziman û nîjadî jî pêk tê, yanî tim hêrsek û acizbûyînek heye. Di dema rewşa awarte de di serî de sazî û dezgehên jinan, atolyeyên jinan hatin girtin. Yanî bi kurtasî şerekî taybet li ser jinên li Kurdistanê pêk tê. Bi taybetî jî hewceye em ji bo jinên ciwan li Kurdistanê kar û xebatên girîng bikin û em ji bo vê yekê niha li ber xwe didin.

**Berxwedana jinan a li qada navneteweyî bi çi rengî didome?**

Li qada navneteweyî berxwedana jinan hem di dema pandemiyê de, hem di demên qeyranên aboriyê de hem jî di nav şert mercên şer de berdewam kir. Mînake herî nêzî me jî mînaka Afganistanê bû ku jinên afganî li hemberî Talîbanê li ber xwe dan. Li gelek deverên cîhanê jin îro li hemberî hişmendiya serdest êdî li ser piyan e. Cihekî wekî Afganistanê jin dizanin ku dê werin kuştin jî lê dîsa ji bo mafên xwe biparêzin derketin qadan. Pêşengtiya herî bi nav û deng jî pêşengtiya jinên kurd e ku îro hê jî di nav şer de ne û li ber xwe didin. Li hemberî polîtîkayên tunehesibandinê tacîz û tecawizê, jin li qadan in. Li her deverên cîhanê jin îro jî hevdû îlhama berxwedan û serîhildanê digirin. Jin dema ku bi hêztir dibin û li ber xwe didin, êrîşên li hemberî wan jî zêdetir dibin. Ji ber ku hişmendiya serdest tehemulî jinên bihêz nake. Li dijî êrîşa ku li kûçe, mal, tax, gund û bajaran de pêk tê jin bi rêxistinbûyîna xwe êdî dibin bersiv. Jin li her parçeyekî êdî ji hevdû hêzê digirin. Dema çîrûskeke berxwedanê li welatekî dest pê bike li gelek deverên cîhanê ev yek dibe mînak û jin ji hev hêzê digirin. Wekî mînaka Xwîşkên Mîrabelê.




## Berfîn Polat kî ye?

Di sala 1996'an de li Licê ya Amedê hatiye dinyayê. Di sala 2013'an de li Zanîngeha Çukurovayê dest bi beşa hiqûqê dike. Dawiyê vedigere Amedê û li vir stajyeriyê dike û di sala 2017'an de mezun dibe. Piştre jî li Baroya Amedê dest bi parêzeriyê dike. Di komeleya Rosayê de jî wekî endama lijneya rêveberiyê cih digire. Bi heman awayî parêzera OHD'yê ye. Hê jî xebatên xwe bênavber didomîne.

# Du taybetiyên mirov: Hevxemî û bêxemî



Adar Jiyan



Di vegotinê de; çi bêje an jî gotina ku ji devê mirov derdikeve, peyamekê dide kesê/a ku guhê wî/wê li ser gotin û vegotinê ye. Ew vegotin, fikra kesê ku wateyê dide bêje û gotinê, ku wê li gorî xwe rave û şîrove dike, bi xwe ye.

Famkirin bêyî vegotinê, vegotin jî bêyî guhdarîkirinê pêkan nabe. Famkirineke baş bi guhdarîkirineke baş, guhdarîkirineke baş jî bi vegotineke baş watedar dibe.

Di vegotinê de derbirîn, rastgotin û watedarkirina têgihê, têgihiştinê hêsan dike û dibe sedema têkiliyên erênî; belê berevajîkirin, şewişandin û çilvirandina têgihê jî watedarkirina têgihê asteng dike û dibe sedema têkiliyên neyînî. Vegotin û bilêvkirin çiqas nêzîkî wateya têgihê ya rastîn be, têgihiştin, ravekirin û şîrovekirin jî ew qas nêzîkî rastiya wê ye. Vegotin û bilêvkirin çiqas dûrî wateya têgihê be, têgihiştin, ravekirin û şîrovekirin jî ewqas dûrî rastiya wê ye.

Gava ku têgihek were navandin, berî her tiştî pêdivî bi tarîfkirin û nasandina wê heye. Agahî, zanebûn û veguhastina têgihê çi qas xurt be, famkirina wî jî ewqas hêsan dibe. Xislet û xisûsiyetên mirovî, takekesî û civakî hemû bi saya bilêvkirin, navandin watedarkirina têgihê pêkan dibe. Bi vê minasebetê em dixwazin hinekî li ser du têgihên dijber ên ku wekî du taybetiyên mirovî tên zanîn, rawestin. Ev herdu têgih ango taybetî; yek jê hevxemî û ya din jî bêxemî ye.

Bêjeya 'hevxemî'yê hemwateya peyva 'empatî'yê ye ku ji peyva yewnanî ya 'pathei' ku tê wateya 'hesîn' an jî 'hishisîna êşê' der bûye û hatiye darişţin. Ev bêjeya yewnanî pey re derbasî zimanê îngilîzî û gelek zimanên din jî bûye û li peyva 'empathy'yê dageriyaye.

Hevxemî, tê wateya huta (melekeya) ku mirov xwe dixe şûna kesê pêşberî xwe. Ango; têgihiştina hest û hizra kesên din; parvekirina bi pejnkerî û hestyarî ya derd û kulên wan; sivikkirna êş, azar, kar û barê wan; çareserkirina pirsgirêk û arîşeyên wan û hwd. hemû bi saya hevxemiyê pêk tên.

Hevxemî, taybetiya mirovî ya erênî ye. Hişmendiya mirovên hestyar, pejnkar û alîkar e. Xisleta kesên bikêr, kardar vîndar e. Xusûsiyeta kesên mirovhez, dilxwaz û dilnewaz e. Hevxemî, hesta kesên gelparêz, pêşbîn û xweşbîn e. Liv û bizava kesên dildar, cefakar û fedakar e. Dilsoziya kesên peşinde, rêzdar û girambar e. Hêvxemî hesta hezkirinê ya mirov ber bi bawerî, ewledarî û rêzdariyê ve dike. Kesên dilpak, rêzdar û ewledar li kesên pêşberî xwe guhdarî dikin û derd û xemên wan baş fam dikin. Her gav xwe dixin şûna kesên pêşberî xwe; êş û kulên wan sivik dikin û ji derdê wan re dibin derman.

Hestên hevxemiyê bi kesên bêhest û dilkevir re peyda nabe. Lewre ew ne xema kesî dixwin û ne jî di xema tiştekî de ne. Kesên ku ne xemxur bin nikarin hevxemiyê pêk bînin û qenciyê bikin. Qencî, fedakariyê û fedakarî jî ked û zehmetiyê divê. Fedakarî, tenê ne ked û zehmetiya di ber nefsa canê xwe de ye; berevajiyê wê qenciya di ber kesên din de ye. Hestên fedakariyê bi dilnermî, xwîngermî û hezkirinê distewin. Hezkirin bi xwe fedakarî ye. Fedakarî xêrxwazî ye. Xêrxwazî qenciyeke bêgerew û bêberjewendî ye. Hêza ku bi hezkirinê pêk tê, yekîtî û hevgirtinê pêkan dike û meriv arasteyî fedakariyê dike. Fedakarî lûtkeya qenciyê û asta dilpakiyê ya herî berz û pîroz e. Tiştê ku mirov ber bi qencî, xêrxwazî û fedakariyê ve dike hevxemî ye. Hêza ku mirov ber bi hezkirinê ve dike jî dîsa hevxemî ye. Heke hevxemî (empatî) tune be; xwîngermî (sempatî) û hezkirin jî tune ye.

Hevxemî, bi kêrî alîkarî, piştgirî, hevkarî û parvekirina pirsgirêkên civakî û pêwendiyên navbera mirovan ên rojane jî tê. Mirovên hevxem hevdû bêtir fam dikin. Hevxemî, têkiliya navbera mirovan xurtir, danûstandin, rêzdarî, hezkirin û têgihiştina wan zêdetir dike. Kesên ku bi hestên hevxemiyê nêzîkî mirovên din dibin, dikarin bi hêsanî dest biavêjin karê wan û alîkariya wan jî bikin. Kesên hevxem, baştir dikarin zanebûn û agahiyên xwe veguhezin kesên derdora xwe û pirsgirêkên xwe yên takekesî û civakî bi wan re parve bikin û bi hev re li çareseriyê bigerin.

Kesên ku bi hestên hevxemiyê tev digerin û xema mirovên din dixwin wekî kesên 'hevxem' an 'xemxur' tên binavkirin. Hevxemî, ji baldarî, hestyarî û pejnkariyê tê. Hevxemî an jî xemxurî taybetiyeke mirovên dilsoz, dilgerm û dilnerm e. Qencî, hestyarî, hevkarî û alîkarî hemû bi hevxemiyê ve girêdayî ne.

Hevxemî, xemgînbûna ji bo kesên din e. Bi vegotineke din hevxemî; xemgîniya li gel an jî li pêşberî kesên ku belayek hatiye serê wan an jî ew kesên ku bi pirsgirêkên xwe rû bi rû mane.

Çawa ku hin têgih bi dijber û dijwateya xwe watedar dibin, hevxemî jî bi dijwateya xwe ya ku wekî 'bêxemî'yê tê zanîn, watedar dibe. Bêxemî, tê wateya xemnexuriyê. Xemnexurî, bêxemiya mirovên tiral, keslan û sersar e.


Bêxemî, taybetiyeke mirovî ya neyînî ye. Hişmendiya kesên qels, xemsar, guhnedêr e. Xisleta kesên bêhêz, bêkêr û bêxêr e. Xusûsiyeta kesên xweperest, xêrnexwaz û dilnexwaz e. Hestê mirovên xweparêz, xwebîn û xudbîn e. Liv û bizava kesên berjewendperest, pexîl û çavnebar e. Bêxemî, qelsiya mirovên dilhişk, ezez û xweparêz e. Hêza xweparêz, mirov ber bî berjewendiyên demdemî, rojane û kesane ve dike. Mirovên ku xwe nexin şûna kesên pêşberî xwe û xema wan nexwin, nikarin wan baş fam bikin. Mirovên ku li kesên pêşberî xwe baş guhdarî nekin, nikarin êş û kulên wan, kar û barê wan sivik bikin û ji derdê wan re bibin derman.

Tiştê ku mirov ber bî berjewendiyên kesane ve dike bêxemî ye. Belê tiştê ku ezîtiya takekesî, xweperestî û bêxemiyê têk dibe û mirov arasteyî gelek hestên erênî dike, hevxemî ye. Hestê herî erênî yê ku bandoreke xurt li ser derûniya kesên ku bi hev re di têkiliyê de ne, dihêle û çawaniyê dide ragihandinê jî dîsa hevxemî ye. Hevxemî, bawerî û xwebaweriyeke xurt dide mirovên pêwendîdar û di navbera wan de dilsozî û dostaniyeke mayînde pêk tîne. Hevxemî, jehrkuja tiralî, xemsarî û bêxemiyê ye. Sêwirandina hest û hizrên erênî yên ku her gav di bîra mirov de cih digirin, bi saya hevxemiyê dikemilin û tekûz dibin. Cihê ku hevxemî, xemxurî ê fedakarî lê hebe, bêxemî, xwebînî û xudbînî lê nadebirin.

# Ya star !



Seyidxan Anter



Wa diyar e, gotinên req û qor yên em bi kar tînin, hew zêde bi kêr tên. Her wiha di van demên dawî de, niviskarên kurd hin gotin û têgehan dixin rojeva kurdan, der heqê etîk, moral û estetîkê de dinivîsin. Di kanalên TV'yên kurdan de ev mijar têne axaftin. Aqûbet li serê meydana siyasî jî be!

Hûn dizanin bê kengî hikumet û genaralan li hev kirin û ji sermayeya (kapîtal) "kesk" û "şîn" re deriyên Tirkiyeyê vekirin. Bi alayên "açilim"an Tirkiyeyê xemilandin. Yek ji wan para kurdan ket- "kurt açilimi" ku di wergera wê de serê kurdan tevlihev bû.

Dewleta Tirkiyeyê çenteyê xwe tije kaxizên muqawelê û qanihkirinê kirin û derketin "seferberlig"ê. Em bûn şahidên gelek tiştan; hunermendên ku ji 10 milyon Ewroyan re gotin na! Kurê xelkên ku ji studiyoyên taybetî re gotin na! Keçen ciwamêran ku ji maaşên safî bist û pênc hezar kron re gotin na..!

**Relativism**

Lê berdevkên dewlet û hikûmeta tirk hin kes jî qanih kirin. Van hevkar û "karkerên" qanihkirî, pişt kul û dawî şil, hin têgînen kevin ji bixêrîka xwe derxistine û belav dikin. Nav li têgeha xwe nakin. Gelo maqûl e ku haya wan ji vî gopalê wan yê bisêhr tune be? Dûrî aqilan e! Em cardin jî bêjin: "Jê re dibêjin, relativism."

Li gorî remza vê têgêhê her tişt relativ e. Ango li çi sînor û zelalîyeke raman, dîrok, polîtîk û civakî napirse. We gotinên relativistan yê wek: "Ma A ji B ne çêtir e?" bihîstine. Demekê gotin: "Ma sivîl ji eskeran ne baştir in?" Gava ku rastiya rastiyê xwe şanî me da, vêca dev guhertin: "Ma AKP ji CHP û MHPyê ne çêtir e?"

Hindik maye bibêjin: "Ma kêr ji çardexurê ne çêtir e?" Mirov bi kêrê dikare kundiran bike du telaş, xiyaran pê biqeşêre, zebeşan bi kêrê hûr bike lê em ji bîr nekin, kêr jî û çardexur jî mirovan dikujin. Û em dizanin ku di kuştina kurdan de gelek caran kêr bi kar hatiye. Ma ne jixwe?

Di nava xelk û civatê de, li gor disiplînên cuda gelek nav û remzên relativismê hene. "De tişt nabe lo, li a xwe temaşe bik!", "Lingên xwe lêx û li kêfa xwe biner!" Ev reng relativism ji feydeya ferdî û rojane pê ve çi norm û pîvanan nas nake.

**Felsefeya pasifîstan**

Relativist carna dilê hev xweş dikin û gotinên siwêdiyan tînin bîra mirov: "Livet har sin gång!" kurdiya wê: "Tiştê bibe betal nabe!" Çarenîvîsa xwe dispêre hêzên li derveyî xwe. Kilîta welatê xwe dide destên dagirkeran. Hêvîşikestî li benda rehma desthilatdaran e.

Taybetmendiyeke relativîstên kurdan heye. Piraniya wan "stanilist û dîndarên" taybet in.

Her ku parî mezin dibe, gotin û cihên wan jî tên guhertin.

Doh "qubla wan" Moskova bû. Piştre berê xwe dan Hewlêr û Silêmaniyê. Ava wan di cokên Kurdistanê re coş nebû!

Bala xwe bidê relativist her tim çav li der, ne li ber deriyê xwe lê li mala xelkê li camcamkan didin. Anha jî li Enqere, Stenbolê û Amedê, rojê şeş caran dixwin.

Ewropiyan ne hema ji ber xwe ve gotine: "Yên mirov li helanê winda dike, mirov li çerx û felekê bi dest dixe!"

Remza wan yek e, navên wan cuda: Kole, War, Har, Bênûr, Kamil, Bêcewher an jî Beyhûda…

Ya star!

# Çekên kîmyewî rewa dikin

Navenda Nûçeyan

**Tirkiye ji 23'yê nîsanê ve êrîşî herêmên Metîna, Avaşîn û Zapê dike. Ji ber ku ji van êrîşan encam nagire bi çekên kîmyewî yên bi peymanên navneteweyî hatine qedexekirin êrîş dike**



Dewleta tirk, êrîşên xwe ji 23'yê nîsanê ve li Metîna, Avaşîn û Zapê didomîne. Artêşa tirk her çiqas bi çekên giran, balafiran û teknîkên pêşketî êrîşî axa Kurdistanê bike jî heta niha tu encam negirtiye. Wexta ku siyaseta tirkan tengav bibe û desthilatdariya wan neçar bimîne, dest bi siyaseta şerê qirêj dikin. Lewma artêşa tirk demek dirêje li ser axa Herêma Kurdistanê çekên kîmyewî bi kar tîne.

Li gorî bîlançayo Navenda Çapemenî û Ragihandinê ya HPG'ê aşkera kiriye, dewleta tirk di 6 mehên dawiyê de zêdetirî 323 caran li dijî hêzên HPG'ê çekên kîmyewî bi kar anîne. Li gorî bîlançoyê 9 jê jin 33 gerîla ji ber van çekên kîmyewî jiyana xwe ji dest dane. Di van êrîşan de tenê gerîla nehatine hedef girtin, ji xeynî gerîlayan bi taybetî jî herêma Behdînanê cih û warên sivîl jî hatine hedef girtin.

**KCK bang li raya giştî kir**

Dewleta tirk piştî ku di 23'yê nîsanê de dest bi operasyonê kiriye, di 10 rojan şûnde, 3'yê gulanê li herêma Avaşînê li ser tûnelên şer ên HPG'ê çekên kîmyewî bi kar anîbûn. Piştî vê êrîşê HPG'ê wêneyên vê êrîşê parvekiribû û KCK'ê piştî daxuyaniyên HPG'ê bang li raya giştî kiribû ku li dijî van êrîşên kîmyewî têkevin nava liv û tevgerê.

**Divê mijar bê lêkolînkirin**

Fermandarên HPG'ê Doktor Bager Baran jî diyar kiribû ku dewleta tirk varyantên cuda yên çekên kîmyewî li dijî hêzên gerîla bi kar aniye û ji bo tespîtkirina vê yekê amûr û derfetên wan ên pêwîst nîne. Ji ber vê yekê Doktor Bager, bang li saziyên pêwendîdar kiribû ku mijarê lêkolîn bikin.

Her çiqas ji hêla sazî û dezgehên ve bi dehan caran saziyên wek Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) û Neteweyên Yekbûyî (NY) jî di nav de bang li gelek sazî û rêxistinên navneteweyî bên kirin jî heta niha tu bersiv nehat û mijar neket rojeva raya giştî ya navneteweyî. Piştre Yekîtiya Bijîşkên Navneteweyî ya ji bo Pêşîgirtina li Şerê Nukleerê (IPPNW) li ser bikaranîna çekên kîmyewî ji aliyê dewleta tirk ve, bang li Neteweyên Yekbûyî kir ku dest bi lêkolînê bike lê ev bang jî têrî lêkolînê nekir.

**Gel derkete qadan**

Piştî ku mijar ket rojeva raya giştî ya Kurdistanê, li dijî bikaranîna çekên kîmyewî gelek çalakî hat lidarxistin. Dayikên Aştiyê li ber deriyê sînor ê Xabûrê yê li Silopiyayê li dijî êrîşên dewleta tirk ên bi çekên kîmyewî meşiyan. Federasyona Civakên Kurdistaniyên li Elmanyayê (KON-MED) li dijî êrîşên dewleta tirk û bêdengiya hikumeta Elmanyayê dest bi kampanya îmzeyan kir. Komeleya Malbatên Şehîd û Wendahiyan (KOMAW) li dijî êrîşan name ji partiyên siyasî yên Elmanya CDU, SPD, Die Gruenen, Die Linke û Wezareta Karên Derve re şandin. Piştî ku 109 rewşenbîr, nivîskar, parlamenter, rojnamevan ên kurdistanî û iraqî bang li Neteweyên Yekbûyî û Komîteya Rêveber a OPCW'ê kirin, ku têkildarî îdiayên li ser bikaranîna çekên kîmyewî li Avaşîn, Zap û Metînayê dest bi lêpirsînê bikin, 44 rewşenbîrên ereb jî heman daxwaz kirin. Lê dewleta tirk her çiqasî rastî bertekên herêmî û navneteweyî hatiye jî êrîşên xwe yên bi çekên kîmyewî bênavber didomîne.

**Bi rêya PDK'ê êrîşan rewa dike**

Tirkiye ku dagirkirina herêmê, bombebarana bi balafirên şer kiriye tiştekî rûtîn û bi rêya PDK'ê dixwaze rewa bike, bi heman şêweyî dixwaze bi pêkanîn û çewisandinên PDK'ê yên li ser saziyên sivîl jî vê yekê wekî tiştekî asayî bide der. Ji bilî vê li gorî agahiyên ku ji herêmê bi dest ketine, gelek belgeyên têkildarî bikaranîna çekên kîmyewî di destê berpirsiyarê leşkerî yên hêzên taybet ên Pêşmergeyên Roj, Zerewan û Gulanê Ezîz Weysî de hene. Tê idîakirin ku di destê Ezîz Weysî de gelek belgeyên di warê bikaranîna çekên kîmyewî de hene û ger wan aşkera bike wê hem dewleta tirk hem jî PDK bi sûcên şer werin darizandin.

**Ji saziyan re belge şandin**

Piştî van daxuyaniyan ev mijar ket rojeva gelê kurd û bi çalakî û daxuyaniyan bang li saziyên têkildar hat kirin. Tê gotin ku heya niha ji aliyê saziyên kurd û gelek kesan ve gelek belgeyên li ser cenazeyên gerîlayên ku bi çekên kîmyewî jiyana xwe ji dest dane û cihên bûyerê wek rapor ji 28 saziyên sivîl, Dewletên Yekbûyî yên Amerîka û gelek welatên Yekîtiya Ewropayê re hatine şandin.Lê heta niha jî bêdengiya van hêzên navneteweyî didome.

## Mêvan ji mêvan aciz e...

Dildarê Amedê

Beriya çend rojan hevdîtinek di navbera Serokê Rûsya Vlademîr Pûtîn û Serokomarê Îranê Ibrahîm Reîsî de pêk hat. Serokê herdu welatan bi rêya telefonê hin mijarên di rojevê de nîqaş kirin. Di nava nîqaşên wan de mijara krîza Sûriyeyê jî hebû.

Pûtîn û Reîsî der barê Sûriyeyê de di mijarekê de gotina xwe kirine yek û gotine ku hebûna hêzên biyanî li Sûriyeyê rê li ber çareseriyê digire.

Sedî sed ev tesbîteke gelekî rast e û divê rojek berî rojekê hemû hêzên biyanî ji Sûriyeyê derkevin. Lê pirsgirêkek li vir heye gelo Rûsya û Îranê hebûna hêzên xwe li Sûriyeyê wekî hêzên biyanî dibînin an na?

Bêguman ew ne behsa hêzên xwe dikin û ne behsa hêzên dewleta tirk jî dikin. Dema dibêjin hêzên derve ew behsa DYA'yê dikin lê jibîr dikin ku hêzên wan bi xwe jî gelek deverên vî welatî dagir kirine.

Dewleta Îranê li aliyê sînorê Iraqê li Dêra Zorê û Bû Kemalê milîs û komên çekdar ên nêzî xwe bicih dike, hewl didin gelê wê herêmê birêxistin bikin û dibistanên zimanê farisî li wir vedikin. Her wiha li aliyê sînorê Libnanê li hin deverên bajarê Humsê jî milîsên xwe bicih kirine da ku bi rihetî karibin xwe bigihînin Libnanê jî.

Ew xewna xwe ya salan pêk tînin û dixwazin xetekê ku ji Iraqê heta Sûriye û Libnanê dirêj dibe ava bikin û xwe lê bicih û war bikin.

Rûsyayê jî ji xwe hemû desthilata Sûriyeyê xistiye bin kontrola xwe û heke heta bi hetayê rejîma Şamê berdewam bike ew nikare ji bin deynên Rûsyayê xelas bibe.

Raste Rûsyayê gelek deverên Sûriyeyê bi rêya peymanên bi dewleta tirk re ji komên çete û çekdaran paqij kirin lê di heman demê li beramberî wê hin deverên Sûriyeyê bi destê dewleta tirk ve berdan.

Rûsyayê bi rêya dewleta tirk ew komên çekdar, ji gundewarên Şamê, Hema, Humus û Helebê dan hev û bi otobusan ew ji wir derxistin û birin li Idlibê bicih kirin.

Li hemberî wê jî dewleta tirk deverên wekî Efrîn, Serêkaniyê, Girêspî, gelek deverên din xistin bin destê xwe.

Îca em vegerin ser daxuyaniya Pûtîn û Reîsî dema ku ew dibêjin divê hêzên biyanî ji Sûriyeyê derkevin, bêguman ew xwe wekî hêzên biyanî nabînin, ew xwe ji malê dibînin.

Tevî hemû nakokiyên di navbera wan herdu welatan de dîsa jî bi dev wiha dibêjin û wekî ku herdu welat xwedî yek helwestê bin.

Lê bi rastî jî bi bo çareseriya hemû pisgirêkên Sûriyeyê divê di serî de ew herdu welat hemû dagirker hêzên xwe ji Sûriyeyê vekişînin.

Dibe ku Rûsya û Îranê bibêjin ew li ser daxwaza rejîma Şamê bi hewara rejîmê ve hatine û hebûna xwe ya li wir rewa bihesibînin lê ev yek ji bo herêma Rêveberiya Xweser ne wiha ye. Wan tu kesek venexwendiye herêma xwe, lê dijberî wê yekê wan her dem li hemberî hêzên ku hewl dane têkevin herêma wan derketine.

Her çendî dibe ku vê yekê mirov nikaribe li ser zimanê rejîmê bêje lê ji bo deverên rizgarkirî yên Rêveberiya Xweser ango ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê mirov dikare bi dilekî rihet bibêje ku mêvan ji mêvan aciz e lê xwediyê malê ji herduyan aciz e.



Xweşkanî

Felemez Ulug

## Bi derewan rastî nayên veşartin

Kolonyalîzma ku di van du sedsalên dawî de li Kurdistanê hatiye jiyîn her tim bi heman taktîk û polîtîkayan pêşketiye. Bi rê û rêbazên cûda hertim hatiye xwestin ku polîtîkayên dewletên mêtinger li ser civakê ferz bikin. Helbet, sîstem jî wisa difikire ku vî awayî encamên girîng bi dest dixe. Bêguman li Kurdistanê di qirkirina kurdan de berdewamkirina rejîma kolanyalîst bi pergalê ve girêdayî ye. Di maşandina vê pergala qirêj de jî, qasî rola hêzên mêtinger, rola kurdên xayîn û xwefiroj girîng e.

Gelê kurd hertim rastî êrîşên qirker û komkujiya hatiye. Di van êrîşan de hertim hebûna fîzîkî ya gelê kurd hatiye hedef girtin. Hêzên emparyalîst di van sed salên dawî de bi îmzekirina peymanên navneteweyî ve hewil dan ku vê siyaseta xwe ya qirker bibin serî. Lewma dewletên mêtinger bi hevkariya hêzên navneteweyî li Kurdistanê siyaseta "dagir bike, birçî bihêle û bide koçber kirin" dan meşandin.

Di van çend salên dawî de jî rejîma AKP-MHP'ê li Bakur, Rojava û Başûrê Kurdistanê ev polîtîkaya qirêj şopand.

Di van demên dawî de bi krîza koçberan a li ser sînorê Belarûsya û Polonyayê, polîtîkayên hêzên mêtinger û dagirker a ku li ser gelê kurd ferz dikin dubare ket rojevê. Ligel van polîtîkayên qirêj hevkariya hin hêzên herêmî ya bi dewleta tirk a dagirker re rewşa heyî kambaxtir dike. Di rastiya xwe de hevkariya PDK'ê ya bi hêzên mêtinger re hertim hebû. Lê ji ber rewşa şer a li Kurdistanê ev yek zêde nedihat bilêvkirin. Lê êdî her kes dizane ku li başûrê Kurdistanê di encama hevkariya PDK'ê ya bi dewleta tirk a dagirker re gel bêzar bûye. Ji bêzariyê wêdetir êdî gel rewşa heyî bi tu awayî qebûl nake.

Dewleta tirk li bakûrê Kurdistanê bi pêkanînên derveyî mirovahiyê, bi hezaran gund şewitand û bi deh hezaran kurd qetil kir. Di encama vê polîtîkaya tundraw de bi milyonan kurd ji neçarî ji warê xwe koç kirin. Dewleta faşîst bi hevkariya PDK'ê ve dixwaze heman rêbazê li başûrê Kurdistanê jî pêk bîne. Kurdên welatperwer ên nayên hevkariya dewleta tirk bi destê îxanetkaran tên koçberkirin, ango ji bo koçber bikin di nav hewildanan de ne.

Bêguman ev polîtîkaya koçberkirinê, mirov dikare bi projaya Rojhilata Navîn a Mezin (BOB) ve girê bide. Di çarçoveya vê polîtîkayê de li seranserî Rojhilata Navîn bi destên hêzên kapîtalîst ve komên çete yên tundraw hatin avakirin. Li gorî hîman, têgehên desthilatdariyên totalîter hatin avakirin. Li gorî vê projeyê mixalîfên li dijî vê pergalê divê werin tasfiyekirin ango ji cih û warên xwe bên kirin. Li başûrê Kurdistanê tiştа diqewime ji aliyekî ve ev e. Hin alî hewl didin ku ji bo berjewendiyên hizbekê ango çend kesan pêşeroja civakekê tarî bikin.

Dewleta tirk li bakûrê Kurdistanê bi gelek rê û rêbazên cûda ev li ser gelê kurd da meşandin. Mîmarê vê projeya qirêj ji bo li parçeyên din ê Kurdistanê îradeya kurdê azad lewaz bikin û serweriya hevkarê xwe zêde bikin serî li projeyên vî rengî didin. Lewma li başûrê Kurdistanê jî mîna li Tirkiyeyê hemû dengê li dijî desthilatdariya PDK'ê tên qutkirin û kesên muxalîf tên girtin.

Rêvebiriya PDK'ê tevî ku hevkariya wan a bi dewleta tirk re ji her aliyî ve aşkera bûye, bêyî ku rexneya li hikumeta xwe bike hewl dide ku koçberkirina ji Kurdistanê bike sûcê PKK'ê. Êdî PDK jî mîna dewleta tirk sedema hemû binketin û lewaziyên xwe PKK'ê dide nîşandan. Lê ez di wê baweriyê de me ku gelê herêmê ji rêvebiriya PDK'ê çêtir PKK'ê nas dike û baş dizanin ku bi derewan rastî tu carî nayê guhertin.

Bêguman çi dibe bila bibe welatê xwe terkirin ne riya çareseriyê ye. Tekane riya çareseriyê li dijî vê têgeha ku ji bo xwe bide jiyîn serî li hemû riyên qirêj û nerewa dide. Ger gel bi yek dengî dengê xwe bilind bike û xwedî li hebûn û warê xwe derkeve wê ev plan û projeyên li ser tê ferzkirin negihêje armanca xwe.

# Xwedayên bêmaske û faşîzma dîjîtal



Kurdistan Lezgiyeva

*Dewleta netewe tevgereke şer a leşkerî û siyasî nîne ku mîna di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de tenê bi dewlet û çandên derketine pêş re têbikoşe. Li dijî tevahiya rêûresma civakî-dîrokî, her pêkhatina nû ya cihê ya hêviyê bide, ji bo paşerojê tevgereke şer a girseyî ya civakî ye. Di mentiqê damezrandina dewleta netewe de, di hedefa wê ya ekonomîk, civakî û siyasî de yek netewe, yek dewlet, yek ziman û yek welat heye. Ev yekên hene wê timî hebûna xwe bi awayekî yek dewam bikin, carnan aşkera carnan veşartî, carnan bi awayekî xwînrij carnan jî bi awayekî demagojîk wê li her bereyî weke şerekî mayînde dewam bike û ji vê bêtir jî maneyeke xwe ya din nîne!*

*Abdullah Ocalan*

Dema em li cîhana îro dinêrin bi çend xalan dikarin lîstikên ku li ser civakan tên pêşvexistin rêz bikin. A yekem bi navê "ewlehî" bi aşkerayî sansûra medyayê û raman tê kirin. Ev sansûr weke ku algorîtmayên Google yan Yandexê tên destnîşankirin. Lê di rastiyê de bi hezaran kes li gorî peywirên ku ji hêla rêveberiya wan taybet ve hatine destnîşankirin rûniştine û hewayê bi pênûsên xwe paqij dikin.

Dijîtalîzasyon bi hinceta têkoşîna li dijî burokrasiyê û hêsankirina gelek proseduran tê destpêkirin. Tu kes wê niqaşê nake. Heger li gorî berjewendiyên gel be ev karekî baş e. Lê tenê di yek rewşê de - heger civak fêm bike ka kî wê kontrol dike û dewlet wê garantiya lîstika adil bide.

Di rastiyê de wekî ku em hem ji ezmûna rojavayî û hem jî ya rûs bi tevahî dibînin di dema dîjîtalbûnê de ewlehiya daneyên kesane tune ne - skandal li dû skandalan pêşdikeve. Wekî din, dîjîtalîzekirina mijarên rojane bi tevahî kontrola welatiyan li pey xwe tîne. Tevî vê rastiyê ku iPhone guh dide xwediyên xwe û Google û Yandex pênc deqe piştî axaftina li mitbexê li ser rûpelên ku vedibin reklaman diguherînin bêyî ku mirov nekene nabe.

Daxuyaniyên bijîşkan a ku dibêjin kesên ku vaksin jî bûne dikarin nexweş bibin û nexweşiyê belav bikin, ji argumanên maqûl a alîgirên vaksina mecbûrî dûr dixe. Ger nexweş bikevin divê ew jî li malê bimînin. Derket holê ku him koronavirusê ku bi çêkirî hatî afirandin û hem jî vaksina du beşên heman operasyonê ne - kêmbûnek tûj di nifûsa mirovî de bêyî şerekî nukleerî.

Perwerdehiya zayendî di bin veguherînek radîkal de ye. Ji kur re nabêjin kur, ji bav re nabêjin bav. Kesên ku gef li civakê dixwin nabêjin xetere ye. Zayenda yek, zayenda dudu ango zayenda X. Di mijara hevjinan de jî jimara yek û dudu heye. Ew çi ye? Têkbirina nasnameya zayendî, civakî û kesane heye.

Di cîhanê de qada sembolîk û nirxê bi tevahî desakralîzekirinek heye. Her cure tabûyên pêwîst û ji aliyê tevahiya dîroka şaristaniya mirovahiyê ve hatine pêşxistin tên tunekirin. Ger tabû ji holê rabin wê demê mirov dibe heywanek.

Perwerde tê tunekirin. HEwceyiya heywanekê bi perwerdehiyê tune ye.

Çand û huner tên tunekirin. Tewra di wê forma dejenere de "rock and roll zindî ye" û deryayek pop heye. Derketiye holê ku ev "mirovên normal û ya herî baş" jî, ku di bin tunekirina tevahî de ye. Di şûna wê de, karakterên wekî Dani Milokhin tên avêtin jor li ber wî deriyên hemû weşanên televîzyon û radyoyê tên vekirin.

Ma ev ne siyaset e? Ma ev ne îdeolojî ye? Kî dikare bêje ku ev hemû bi ji xwe ve diqewimin?

Ango li cîhanê li ser bingehên sereke yên şaristaniya mirovatiyê êrîşeke bi zanebûn, navendî di warê hêz û wateyan de heye. Aktorên vê êrîşê bi têra xwe bi hêz in û îmkanên pêwîst ên rêxistinî, aborî, siyasî ne ku li ser asta cîhanê pêk bînin. Dewletên netewe bi aşkera di rêza duyemîn de ne, di berevaniyê de ne û neçar in ku di mijarên sereke de polîtîkayên nakok bişopînin.

Daxuyaniya hin pisporan jî mirov didin fikrandin ji ber ku dibêjin versiyonek heye ku piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, Amerîka ku sûcdarên Nazî anîn welatê xwe, di şerê ramanan de winda kirin û Naziyan hêdî hêdî dest bi desthilatdariya Dewletên Yekbûyî kirin alîgirên xwe bi navgîniya klûbên girtî û dibistanên elît berhev kirin. Û dewleta kûr bi rastî ji komek krîpto-faşîstên ku dixwazin vegerin ser desthilatdariyê pêk tê û li seranserê cîhanê ew di nav kar de ne.

Di encam de wek em dibînin pêşbîniyên Rêberê Gelê Kurd birêz Abdullah Ocalan carek din rast derketin û ji ber vê dixwazim nivîsa xwe bi gotinên wî bi dawî bikim:

*Bi têgihiştina şaristaniya demokratîk hilberandina zanistê şensekî gelekî mezin e. Nexasim di atmosfera krîz û kaosê de pêdiviya bi zanisteke nû bi tenê bi serdestiya paradîgmaya civaka demokratîk safî dibe. Bêyî çareserkirina pirsgirêkên epîstemolojîk wê çareseriyên pratîk pêş nekevin, eger ev wisa ye, hingî divê paradîgmaya dewleta netewe were hilweşandin û paradîgmaya modernîteya demokratîk bi serkeve, ev yek wê mirov bigihîne hêza çareseriyê.*





# Li eniya rojava guhertin tune ye

Zinar Ronî

Yê sosyal demokrat dibêje ez ê Qendîlê hilweşînim. Yê sosyalîst kurdan li gorî xwe dike du beş. Yê faşîst Kurdistanê tune dihesibîne. Şefê mezin li pey qirkirinên nû ye. Aborînasê wan kurdan dişibîne neynûkê. Dîroknasê wan hêj di nav hewldana tirkkirina kurdan de ye. Stranbêja wan di bernameya zindî de alaya tirkî dide destê yekî kurd û dibêje 'bêje ez kurd im'

Mafyayê wan behsa ew qas qirêjiyan dike lê ji bo îşkence û wahşeta li ser kurdan kiriye yek gotinê jî nabêje. Akademîsyenekî ji ber gotina 'Kurdistan' diavêjin zîndanê. Lê şefê mezin li Êlihê bi stranên kurdî tê pêşwazîkirin. Mixabin di stranê de gotina 'kurd' sansûr dikin. Ji ber gotina stranên bi kurdî mirov bi hêsanî têne kuştin. Hê jî miriyên kurdan bêgor in. Konserên kurdî têne qedexekirin…

Mirov dikare vê lîsteyê wisa dirêj bike. Lê ez bawer im ji bo mebesta me ev, têrê dikin.

Li gorî xwe tasnîfkirina kurdan ji wan re bûye nexweşiyek, bûye kevneşopî. Ji aliyekî ve mafdar in. Kurd wekî wan nakin, bi ya wan nakin. Zilma wan qebûl nakin. Ew tirkên girs ê di mirovbûnê de di asta payebilindiyê de ye ji ber helwesta kurdan piçûk dibe. Kurd di cîhanê de wan piçûk dixin. Yanî ne ji kurdan be niha dê çûbûna ser heyvê(!). Kurd xêrnexwaz in. Halbukî dewleta wan ji hemû dewletan zêdetir birehm e. Yanî kurdan wekî mirov qebûl dike, ma hêj çi dixwazin.

Balkêş e heke bi van gotinên li jor min anîne ziman, em bikevin pey şopa xwediyê wan dê were dîtin ku yek ji



wan jî ne tirk e. Kesekî eslê xwe wenda kiribe normal e bixwaze yên din jî eslê xwe wenda bikin.

Kurdbûn, tirkbûn, ermenîbûn, erebbûn bi serê xwe ne tiştek e. Kurdan heya niha nayê bîra min li ser neteweyeke din ferz kirine ku ew jî bibin kurd. Yanî yekî tirk bibe kurd, kurd wê çi qezenç bike? Yeke ereb bibe kurd, li ser kurdan çi zêde bibe? Di her kêliyê de ferzkirina tirkbûnê çi ye? Di cîhana wan de kî çi qas behsa tirkbûnê bike ewqas puan qezenc dike. Kî dikeve zorê, berê xwe dide kurdan, ermeniyan û dest bi heqaretê dike. Nexweşiyeke çawa ye hêj nehatiye fêmkirin. Di rastiyê de tê fêmkirin lê faşîzm çavan kor dike

lewma nayê dîtin. Êdî em dizanin kî zêde behsa al, welat û tirkbûnê bike binê wî şil e.

Li Sêrtê mamosteyeke faşîst di malpera xwe ya twîterê de dibêje 'ez îro herim dibistanê ji hewalên piçûk ataturkperestan çêbikim.' Bila biçin lêkolîn bikin heke ew mamoste ne di nav karê qirêj an jî karên bêexlaqî de be wê demê em tiştek nizanin. Em bavikên wan baş nas dikin. Hewcehiya me bi bavikên wan tune ye. Rêberên me û pêşengên me hene. Têr û tije jî hene.

Li Tirkiyê ji avakirina komarê û vir ve hem desthilat hem jî beşeke mezin a çepgir her tim xwe ser civaka rojhilatanavîn re digirin. Mirov dikare vê helwestê bibe heya berî komarê jî. Kadroyên cemiyeta îttîhat û terakkî bi feraseta rojavayî xwe ser her civakê re didîtin. Xwe ji padîşahê osmaniyan pêşketîtir didîtin. Padîşah dij-demokrat dihesibandin. Lê dema hatin desthilatê ji padîşah xerabtir kirin. Ji wê rojê ve çi kes çi jî kom û partî heke li hemberî dijberiya desthilatê behsa azadî û demokrasiyê bikin divê qet bawerî bi wan neyê.

Di vê dema krîtîk de muxalefeta Tirkiyeyê li hemberî desthilatê bûye xwedî avantaj. Hema bêje her karûbarê desthilatê rexne dike û li hemberî wê derdikeve. Ev ji aliyekî ve hêvî dide. CHP cara yekem ji tezkereya ku destûra dagirkirina başûr û rojavayê Kurdistanê dide hikumetê erê nake û di dengdanê de jî helwesta xwe nîşan dide. Lê tam dema ku mirov dibêje ev baş bû tu dibînî, tiştek din diqewime. K.Kiliçdaroglu ji tezkerê re got 'na' lê vê carê heman şexs di axaftineke xwe de tîne ziman ku ew dê Qendîlê hilweşîne. Dema ew wisa biqîre bêguman hinek jî bêjin 'hoppp'. Ma ewqas hêsan e.

Yên desthilat li qirkirina kurdan digerin, yên muxalîf jî tiliya xwe dihejînin û aqil didin kurdan. Her ku rayên desthilatê kêm dibin û rayê tifaqa milet zêde dibin rastiya wan jî derdikeve holê. Hem gotinên rayedarên Îyî Partiyê û hem jî daxuyaniyên CHP'ê dide nîşandan ku di siyaseta dewletê de tu guhertin çênakin. Yek ji van nîşaneyan serdana şandeya CHP a başûrê Kurdistan bû. CHP ji niha ve hem bi eşîrên bakurê Kurdistanê re ketiye nav danûstandinan û hem jî bi rêveberiya Başûr re têkiliyan pêş dixe. Nabêjim çima têkiliyan pêş dixe. Mesele ev e, ev têkilî li ser çi pêş dikevin.

CHP'ê ji balyozxaneyên dewletên Yekitiya Ewropayê re name şand. Di nameyê de wekî ku desthilat mîsoger kiribe tîne ziman ku divê ew êdî bi desthilata heyî re nekevin nav kar. Berê jî bangewazî li memûr û burokratên dewletê kiribû ku nebin hevkarê karê qirêj ê desthilatê. Ev rewş ji aliyekî ve nîşan dide ku dewletên rojava êdî ji desthilata AKP-MHP'ê aciz bûne û riya desthilata tifaqa milet vekirine.

Ber bi desthilateke nû ve em diçin lê wisa xuya dike ku li eniya rojava tu guhertin tune ne…

Çi hebe li rojhilat heye. Bila çavê me li rojhilat be.

# Rêbaz û armanca şer û xweparastinê

Rohat Kurêşî


Du rêbazên şeran hene. Yek jê ji bo berjewendî û desthilatiyê ye. Ye din jî ji bo li dijî vê xweparastin e. Ji dîroka mirovahiyê ya despêkirina şeran heta niha ev wiha hatiye. Hin şer bi çekan tên kirin, hin şer jî bi rêbazên din yên mîna; birdozî, di nav vî şerî de nijadperstî û olperstî jî heye ku car caran ev vediguhere şerên çekdarî. Car caran jî bi rêya, bawerî, çand, huner, rêbaz û polîtîkayên cuda tên meşandin. Lê armanc yek e, ew jî tunekirin û serwerî ye.

Ji hev cudakirina şeran girîng e. Wekî me di destpêkê de jî got yek jê ji bo serweriyê ye yê din jî ji bo xweparastin û di encamê de xwe ji van êrîşan rizgarkirin, azadkirin e. Li aliyê din jî şer bi xwe wekî hunerekê tê pênasekirin. Yên ku vê hunera şer nizanibin nikarin bi ser jî bikevin. Ev huner jî parçeyek ji çandê ye. Dema çand tê gotin ne ew çanda ku tenê em ew parçeyê wê yê hunerî fêhm bikin. Lewra çand tecrube û serpêhatiyên di pêvajoya herikîna dîrokê ya mirovahiyê de heta roja îroyîn a jiyanê hatiyî ye. Ligel vê, çanda her netewe û civakê li gorî erdnîgarî û avhewayê diguhere. Li gorî şert û mercên jiyanê ji hev cuda ne. Lê ya girîng parastina wê çandê ye. Parastin û pêşxistina jiyaneke biehlaq û polîtîk a netewe û civakekê nirxên giranbuha ne. Parastina nirxan jî bi ehlaqekî çandî yê civakî ve girêdayî ye. Ew kesên ku dikaribin nirxên xwe biparêzin di heman demê de dikarin çand, nasname û hebûna xwe jî biparêzin. Ji bo vê jî pêwistî bi zanebûn bîr, hiş û hişmendiyeke kûr heye.

Divê mirov zanibe ku şerên tên kirin ji bo çi ne û li pêşberî şeran ji bo xweparastinê pêwistî bi helwest û tevgerîneke çawa heye. Heke mirov xwedî serwextiyeke tecrubeyên jiyanî be wê demê mirov dibe parêzvanê hebûna xwe, çand, nasname û nirxên xwe. Li pêşberî êrîşan mirov dikare bi zanebûna xwe, bi kûrahiya xwe şer bike û destkeftiyên xwe yên jiyanî biparêz e. Lê belê dema mirov ne xwedî çand be wê demê hemû destkeftî ji dest diçin û di rewşeke wiha de dijminê mirov bi ser dikevin. Mao Zedong dibêje; "Leşkerê bêçand leşkerek nezan e û leşkerê nezan nikare dijmin têk bibe." Ev gotin ji bo me kurdan bêtir girîng e. Lewre em kurd divê zanibin ji bo çi û ji bo kê şer dikin. Beriya her tiştî divê em xwe, nasnemeya xwe, çand û nirxên xwe zanibin. Li şûna ku em bibin leşker, maşok, noker an jî sîxurên dijminê qewmê xwe divê em ji bo xwe, axa xwe, civak û nirxên xwe şer bikin.

Mesele çi dibe bila bibe, heke îro sonda tunekirina gelê kurd hatibe xwarin di encamê de armanc yek e û ew jî tunekirina tevahiya kurdan e. Ev ne ya parçeyekî yan jî tevgerekê tenê ye, tunekirina hemû kurdan e. Çawa dibe ku mirov vê yekê fêhm neke? Çawa dibe ku mirov sed salan bindest be, di komkujiyên mezin re derbas bûbe, bi tu awayî hebûna mirov, çand û nasnameya mirov, zimanê mirov nehatibe qebûlkirin û mirov rabe bibe şirîkê vê tunekirinê. Bêlome bî ev rewşeke herî kambax a ketina mirov e. Ev bêçandî û bêaqiliya mirov dide xuyakirin. Jixwe berovajî vê pênaseyê fikirîneke dinin xetertir û metirsîdar e.

Em îro li rewşa kurdan binêrin; Dewletên serdest niştiman kirine çar parçe, di her parçeyekî netew kirine hezar parçe. Van dewletan li her parçeyekî Kurdistanê kurdên xwe ava kirine û wan dikin şirîkê sûcên xwe yên tunekirina kurdên azad û berxwedêr. Ew kurdên ku bûne şirîkê dijminê qewmê xwe, pê re ne bîr maye, ne jî hiş û hişmendiyeke kurdewar a welatparêzî. Pê re ne ehlaq maye, ne jî rûmet. Ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî di xizmeta dijminê xwe de li dijî qewmê ku ji nav hatiye şer dikin. Ji ehlaqê civakê, çand û nasnameya kurdewarî dûr ketine. Heke kesên ku ji van pîvanên mirovî, neteweyî û civakî dûr bikeve tê wateya derketina ji civakê, tê wateya dûrketina ji ehlaq, çand û nasnameya ku wê hebûnê îfade dike. Yên ku ji civakê biqetin jî bi tenê dimînin û ew tenêtî ji her êrîşê re vekirî ye. Di rewşeke wiha de dê nikaribin hebûna xwe jî biparêzin. Dê di hemû şeran de winda bikin. Lewma jî kesên bê çand, kesên bê bîr, kesên nezan nikarin xwe jî biparêzin.



# Kurdî Kurdistano Federal ra remenê



Mehmet Şahîn



Heme civakan yew bi yew xo rizgar kerd, la kurd nêeşkayî xo rizgar bikerê. Zaf sebebî estbî, la nê sebeban ra di hebî zaf muhîm bî. Yew, çinbîyayîşê tîfaqê neteweyî, o bînî zî yewbîyayîşê dînê ma û yê tirkan o.

Seke ma heme zanê şaro tirk aîdê Anatolya û Mezopotamya nîyo. Asyaya mîyanine ra ameyo û bi sayê hetkarîya kurdan badê şerê Melezgîrî yê 1071î Anatolya de bi ca bîyo. Wexto ke dewleta osmanî qels bî û ver bi rijnayîşî şî, tersê qewernayîşê înan ya Anatolya û tersê reyna bê welat mendişî kewt zerrîya înan. Nê tersan vera gam bi gam ver bi sîyasetê nîjadperstîye ke çinkerdişê şaranê Anatolya û Kurdistanî esas girewtêne ra şî. Seba ke bê welat nêmanê û vajê Anatolya û Kurdistan welatê ma yo dest bi sîyasetê tirkkerdişê Anatolya û Kurdistanî kerd. Seba serkewtişê sîyasetê xo mudaxaleyê xoserîya civakan kerd û peynî ro pergalê xoserîya civakan ard û zext û zordarîya xo serê heminan de ferz kerd.

Waşt bi otorîteya navendî qeternayîşê şaran ya dewleta osmanî rê vindarno. Înan bi zext û zordarî di binê serwerîya xo de verdo. La sernêkewt û nêeşka vindarno. Hema hema heme şaranê bînan bi rihê neteweyî seba azadîya xo sere wedart û xo rizgar kerd. La kurdî û Kurdistan binê lepanê zordarîya osmanîyan de mendî. Çinbîyayîşê tîfaqê neteweyî û misilmanîya kurdan karê dewleta osmanî asantir kerd. La nêameyê menî ke do kurdî statû cuyayîşê xo yê xoser ya hezar serran ra birihetî fek veradê.

Kurdan fehm kerd çinbîyayîşê xoserîye çinbîyayîşê statûyê civatî yo, çinbîyayîşê statû çinbîyayîşê civatê kurdî yo. Coka bi hêrsêko gird û serewedernayîşanê girdan cevap da nê mudaxaleyanê osmanîyan. Bi desan serewedernayîşî virazîyayî. La nê serewedernayîşî bi rihê neteweyî nê, bi rihê eşîrî, mîrîtî û begîtî were ameyî. Coka heme herêman de teng mendî û sernêkewtî. Xoverdayîş û qehremanîyê zaf girdî virazîyayî la çi heyf ke heme bi qetlîyamanê şarê kurdî encam bî.

Serewedernayîşo yewin bi rayberîya Mîr Evdrehmanê Babanî di 1806î de şaristanê Silêmanîye de dest pê kerd. A roje ra nata 215 serrî yo civata kurd seba statûya xo, seba estbîyayîşê xo bê beyntar serewedernayîşan de ya û xover dana.

215 serrî yo polîtîkaya tirkistankerdişê Kurdistanî di merîyete da ya. 215 serrî yo seba ke kurdî nêbê wayîrê statû û nêeşkê estbîyayîşê xo bipawê polîtîkaya qirkerdişî, talankerdişî, wêrankerdişî û çinkerdişî serê civata kurd de ramnenê.

Dewleta osmanî rijîya û çin bî, la polîtîkîya çinkerdişê civata kurd û tirkistankerdişê Kurdistanî nêbedelîya. Komara tirke ya ke 1920an de serê mîrateyê osmanîyan de awan bî, hetê polîtîkaya çinkerdişê kurdan de bi awayêko hîna xidar dewam kerd. Parçeyê Kurdistanî başûr û rojawa yê ke di binê desthilatdarîya tirkan ra vejîya bî, heman aqûbetî reyde rî bi rî mendî.

Dewleta tirke polîtîkaya çinkerdişê kurdan ser dewletanê bînan ferz kerd. Yew babeta ke çar dewletê dagirkerî serê ci de pê kerdî, tena qirkerdiş û çinkerdişê civata kurd bî. Di Rojhelat de ecembîyayîş, di başûr û rojawa de erebbîyayîş, di vakur de tirkbîyayîş serê civata kurdan de ame ferzkerdiş. Di çinkerdişê kurdan de di rayîr û raybazanê xo yê bêexlaq, bêheq û hiqûq de sînorî nas nêkerdî.

Di çar parçeyan de kurdanê ke ecembîyayîş, erebbîyayîş, tirkbîyayîş qebûl nêkerd, kurdanê ke kurdîtîya xo de israr kerd û qarşî polîtîkaya çinkerdişî de xover da ya kewtê zîndanan, ya ameyê kiştiş û ya zî welat ra ameyî teberkerdiş. Yê ke waştê sey kurdêk bicuyo şansê ci yê cuyayîşî Kurdistan de çin bî.

Tena bi nê kiryaranê xo nêvindertî, seba ke demografîya Kurdistanî bibedelnê bi mîlyonan kurdî Kurdistan ra koçber kerdî, başûr û rojawa de erebî, rojhelat de ecem û azarî, vakur de tirkî, lazî û afganî ardî Kurdistan de bi ca kerdî. Bi kilmî seba ke kurdan Kurdistan ra bivejê teber û terkî welat bikerê û demografîya Kurdistanî bibedelnê çi destê înan ra ame kerd û kenê.

Na polîtîkaya çinkerdişê kurdan û tirkistankerdişê Kurdistanî bi heme xidarîya xo nika zî merîyete de ya. Dewleta tirke seba ke kurdî nêbê wayîrê statû û estbîyayîşê xo qayim û mayinde nêkerê heme qewetê xo seferber kena, seba çinkerdişê statûya rojawa û başûrî çi destê aye ra yena kena. Seyîn vakûr de estbîyayîşê kurdan rê, ziwan û çandê kurdan rê tehammul nêkena di parçeyê bînan de zî estbîyayîşê kurdan rê tehammul nêkena.

Bado ke Efrîn, Serêkanî û Girêspî dagir kerdî, di sere de tabelayê kurdî ardî war. Seba ke demografî bibedelna kurdî qewernayî, mal û milkê kurdan dayî çeteyanê xo û çeteyê xo ewca de bi ca kerdî. Nika heman çî di başûrî de kena. 23ê nîsane ra nata hêrîşê başûrê Kurdistanî kenê. Heta nika nizdîyê 150 dewê başûrê Kurdistanî veng kerdê û wazenê çeteyanê xo ewca de bi ca bikerê.

Belê, dewleta tirke verê çeteyanê xo dana Kurdistan û înan Kurdistan de bi ca kena. La verê ciwananê kurdan dana dewletanê Ewropa û înan mecbûrê terkkerdişê welatî kena. Seba ke Kurdistan kurdan ra xalî bikera û xoverdayîşê kurdan bişikna ciwananê kurdan rê teyareyanê xo kena espar, bena Belarûs de dana ro û verê înan dana dewletanê Ewropa. Zafê ci serê Tirkîya ra bi keştîyan şirawena Ewropa.

Seke ma cor de vat; civata kurd 215 serrî yo seba destvistişê statû û xoserîya xo xover dano. Badê xoverdayîşêko bêhempa û bi dayîşê berdêlêko zaf giran di başûr û rojawa de statûya xo ya xoserî bi dest vist. Statû yena manaya cuyayîşêk kurdewar, bextewar, bê ters û xofî. Yena manaya estbîyayîş, qayîmbîyayîş û mayîndebîyayîşê kurd û Kurdistanî. Bi kilmî yena manaya têkşîyayîş û çinbîyayîşê xeyalanê dagirkeran yê çinkerdişê kurd û Kurdistanî. Coka xeyalê dewleta tirke ya yewîne statûyan orte ra wedarna û terkkerdişê welatî ê kurdan dewam bikero.

Polîtîkaya dewleta tirke û ya dewletanê dagirkeran ê bînan dîyar a, çinkerdişê kurd û Kurdistanî ya. Ganî polîtîkaya kurdan hewceyo pûçkerdiş û çinkerdişê na polîtîkaya dagirkeran bo. No zî di welatê xo de mendiş û bi xoverdayîşî pêkan o.

Badê xoverdayîşê 200 serran bi berdêlêko giran 30 serrî verê cû di başûr de statûya kurdan virazîya. Xoserî ra zêde Kurdistano Federal awan bî. Ganî na herême seba heme kurdan biba cayêko asayî, biba cayêko ke kurdî tede şad û bextewar bicuyê. Hewceyo ganî verê kurdan heminan ver bi na herême biba. La heyf û mixabin başûr bîyo pêkolê dagirkeran. Dagirkerî tede şad û bextewar cuyenê.

Şermo tewr gird oyo ke ewro ciwanê kurdî tewr zêde na herêma başûrî ra terkê welatî benê û bi teyareyanê dewleta tirke û yê Bexdayî verê xo danê dewletanê Ewropa. Serê sînorê dewleta Belarûs û Polanya de verê çimanê cîhanî de trajedîyêk yena cuyayîş û penaberê ke na trajedî de ca genê çi heyf ke zafê înan ciwanê başûrijî yê. Ciwanê başûrî zilm û zorê dagirkeran ra nêremenê zilm û zordarîya desthilatdarîya kurdan ra remenê. Wina asîyeno ke her çiqas rayberê başûrî kurdî bê zî hişmendîya ke serê karî de ya yê dagirkeran a.

No îspat keno ke tena kesayet ê rayberanê kurdan bo bes nîyo, hewceyo hişmendîya rayberan kurd û kurdewar bo.




# Bi seyan hemwelatîyê Iraqî Belarusî ra apey erşawîyayî

Selahîyetdaranê Bexdadî pare kerd ke tewr tay 400 hemwelatîyê Iraqî yê ke Belasur de mehsur mendî bi teyarayanê Charterî Minskî ra apey erşawîyayî Bexdadî.

Vervatoxê Wezaretê Karanê Zereyî yê Iraqî Ehmed El Sehafî vat: ''Ame parekerdene ke ewro 460 koçberî semedo ke şorê Iraqî siwarê teyarayan bîyî, ekîpanê sersefîrîye yê Belarusî zî vat ke qeydkerdişê nameyê 50 kesanê bînan zî dewam keno.''

Teyara vizêr erey Minskî ra perayî. Teyaraya ke raywanê ci zêdêr kurdî bîyî şan Bexdad de ameye war. Heta nika serê sînorê Belarus-Polonya de 2ê ci kurdê Başûrî 11 koçberan dinyaya xo bedilnaye. ***BEXDAD***

# Yadkerdişê Seyîd Rizayî sey sûc hesibîya

Rayber û pîrê Dêrsimî Seyîd Riza, Wusênê Seydî, Alîyê Mirzê Silî, Hesen Aga, Findiq Aga, Resik Uşên û Hesenê Ivraîmê 15ê teşrîna peyêne ya 1937î de hetê dewleta tirke ra Xarpêt de Meydanê Bugdayî de ameybî dardekerdene. Gorê Seyîd Riza û embazanê ci qetî nêameyî eşkerakerdene. 84 serrî yo rixmê xîretanê keyeyan zî dewlete cayê goran eşkera nêkerd.

Dardekerdişê Seyîd Riza û embazanê ci ra dima semedê dêrsimijan surgunîye dest pêkerde. Goreyê doneyan ê fermîyan Terteleyê Dêrsimî (Jenosîd) de 1937 de 1737 û 1938 de 6 hezar û 868 kesî ameyî qirkerdene. La goreyê tarîxnasan jenosîd de tewr tay 70 hezar merdimî ameyî qirkerdene, bi des hezaran kesî ameyî surgunkerdene û domanê kênayî ameyî dayene keyeyanê leşkeran.

Tay temsîlkaranê rêxistinanê komelê sivîlî û kesayetan serrgêra 84. ya îdamê Seyîd Riza û embazanê ci de semedê merasîmê yadkerdişî vilawekê agahîye vila kerdî. Serdozgerîya Komare ya Dêrsimî derheqê nê kesan de bi îdîaya 'wasifnayîşê sûc û sûcdaran' tehqîqat da destpêkerdene.

Çarçewa tehqîqatî de veng dîya Hemserekê Partîya Deokratîke ya Şaran (HDP) yê Dêrsimî Îbrahîm Kasun û Nurşat Yeşîl, Hemsereka HDPyî ya qezaya Merkezî Ozlem Toprak, Îdarekara HDPyî ya Dêrsimî Yasemîn Soylemez, Endamê Komeleya Elewêyê Demokratîke (DAD) Hidir Yilmaz, Serekê Merkezê Cigêrayîşanê Dêrsimî Selman Yeşîlgoz û zaf kesanê bînan ke Mudirîya Asayîşî ya Dêrsimî de îfade bidê.

Vilawekan de wina amebî nuştene: '"Ma serrgêra 84. ya îdamanê înan de Seyîd Riza, Uşenê Seydî, Findiq Aga, Resik Uşen, Alîyê Mirzê Silî, Hesenê Îvraîmê Qijî, Hesen Aga yad kenê.", 'Xo Vîra Meke', 'Çila Xo Roştî Ke' ***DÊRSIM***






## Mamoste û xwendekar

Mamoste ji xwendekarên xwe re dibêje ji min re mijarekê li ser xwezayê binivîsin. Xwendekarekî bi navê Ehmo mijara xwezayê wiha nivisandibû: Dinya bihar bû ez ji xwe re derketin nava gul û kulîlkên xwezayê. Min kurmek li erdê dît. Îca kurm ji xwe ne tenê celebek in, kurmê erdê hene, kurmê hevirmêşê hene, kurmê daran hene.


Mamoste dîsa got ez dixwazim vê carê hûn li ser fêkiyan binivîsin. Dîsa Ehmo nivîsa xwe wiha dest pê kir. Min sêvek xwar min dît ku kurm di nav de ye. Îca kurm ne tenê celebek in, kurmê erdê hene, kurmê hevirmêşê hene, kurmê daran hene.

Mamoste ji Ehmo aciz bû û got vê carê li ser fezayê binvîsin û berê xwe da Ehmo û got : binêre Ehmo li fezayê kurm tune ne ha.

Ehmo vê carê nivîsa xwe wiha dest pê kir. Min li fezayê nêrî min hîv û roj dîtin. Erê wele min bi van çavên xwe dîtin, ev çavên ku wê kurm bixwin. Îca kurm ji xwe ne tenê celebek in, kurmê erdê hene, kurmê hevirmêşê hene, kurmê daran hene.

***Hesen Hemkê***

# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**1-**Ez çûm ser zinarekî
Tiliya min ket qulekî
Dengê min çû hezarekî
Gelo ew çi ye?

**2-**Tiştek min heye
Mamê mino
Ez çûm serê banekî
Min lêxist gopalekî
Deng çû welatekî
Kî dizane ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**
**1-** Çifte, tiving **2-** Def, dahol


# Zivistana îsal dijwar e



Salekê wê vê demê dawiya payîzê û destpêka zivistanê bû, endamên qebîleya çermsoran ji rêberê xwe pirsîn gelo wê zivistana îsal çawa be. Bi metirsî got wê zivistaneke sar be, dest bi berhevkirina êzingan bikin. Ji bo lîderê wan agahiyên xwe piştrast bike li saziya şopandina rewşa hewayê geriya û wan jî jê re gotin: wê zivistan gelekî sar be. Piştî çend rojan dîsa endamên qebîleyê ji lîderê xwe pirsîn. Vê carê lîderê wan bê şik û guman got: erê wê îsal zivistan gelekî sar be. Heta hûn dikarin destê xwe sivik bikin û ji xwe êzingên xwe deynin. Piştî çend rojan dîsa lîderê qebîleyê li saziya şopandina rewşa hewayê geriya û dîsa pirsî we gotibû wê gelekî sar be ne wiha. Saziyê vê carê jê re got, wê îsal zivistanek wiha dijwar bê ku tu salan me swermaya wiha nedîtiye. Vê carê lîderê qebîleyê ji wan pirsî: Xwedê ji te razî ka bêje hûn çawa dizanin ku zivistan gelekî dijwar be. Endamê saziya şopandina rewşa hewayê jê re dibêje: Ya rastî em dibînin û dişopînin ku îsal qebîleya çermsorên herêma me ji her sal bêtir êzingan didin hev loma ez texmîn dikim ku wê zivistan gelekî dijwar derbas bibe.

***Dara Mirada***

# XAÇEPIRS




**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Heywaneke jehrî û bi saw 3. Kesên ku guhê wan nabihîze 5. Kenar, qurzîk 6. Ava ku piştî barana zêde diherike 7. Aqil, bîr 9. Ronahiya çavan 12. Mêvanê rê, kesên ji cihekî diçin cihekî din 14. Notayeke mûzîkê 15. Cihê pêşandana filman 17. Cinavkek bi awayê tewandî 18. Cînavkeke nîşandanê 22. Bajareke rojhilatê Kurdistanê

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Beşekî laşê mirovan
2. Dîl, hêsîr
3. Cînavkeke pirsiyariyê
4. Xwedawendeke misra kevin
5. Koma pez
7. Nelirêtî, gendelî
8. Şev (bi soranî)
10. Roja em tê de ne
11. Giran, bêhna fireh, ne bi lez
13. Şeva em tê de ne
14. Çerx, zeman, dem
16. Rewşenbîrekî kurd Mele Ehmedê…
19. Îca
20. Yek ji televizyonên kurdî ên destpêkê
21. Yan
23. Cînavkeke yekjimar ê tewandî

## Bersiva hefteya borî




LI HEMBER TUNDIYA
MÊR-DEWLETÊ Û XIZANIYÊ
EM TÊDIKOŞIN
♀ Em li dijî serdestiya mêran, serî natewînin!
♀ Em li dijî polîtîkayên dagirkerî û mêtingeriyê, dengê xwe bilind dikin!
♀ Em li ziman, çand û nasnameyên xwe xwedî derdikevin!
♀ Em talana xwezayê, kedxwarî, îstismar û destdirêjiyê qebûl nakin!
♀ Em Jin, bi hev re hene, bi hev re bi hêz in!
♀ Em ê vê pergalê biguherînin û jiyana nû ava bikin!
Di 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya Li Ser Jinan û Piştevaniyê ya Cîhanê de, em li dijî êrişên li ser maf, destkeftî û bedena xwe li her derê dengê xwe bilind dikin! Bi dirûşma "Em Li Hemberî Tundiya Mêr-Dewletê û Xizaniyê Têdikoşin!" li her derê serhildana xwe bilind dikin!
LI DIJÎ TUNDIYA MÊR-DEWLETÊ EM TÊDIKOŞIN!
JIN BEXÇEYA VEŞARTÎ YA AZADIYÊ YE
NAVÊ MIN FURKAN E
ADIM ŞEYMA
ÖLÜMSÜZDÜR!
Deniz POYRAZ
HDP
KADIN MECLİSİ

xwebûn

22-28 Mijdar 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 101

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Elif Can Alkan
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Çîroka Dêra Mor Behnam

Welatê Qoserî

Ji destpêka mirovahiyê dest pê kiribû; biryar hate dayîn cureyên cuda hatin afirandin. Her cureyekê rengek, her rengek jî bedewiyek da jiyanê. Bi Zerdeşt berdewam kir. Dualîtî, başî, xirabî, tarî û ronî bi hev re watedar bûn. Bi hev re xweşik, bi hev re rengîntir. Navê vê 'cudahî' bû. Çiqas cudahî ew qas rengdarî.

Birûskê lê xist. baranek hûrik bariya... ew ji cudahiyê bû. Vê cudahiya bibereket bi xwe re keskesoreke heftreng anî. Ax xweşiktir, esman bedewtir û mirov rengîntir bûn. Navê vê cudahî bû. Mirovan li keskesorê nêrî cudahî parast. Sumerî, akadî, elamî, suryanî, keldanî, kurd, ereb, ermenî kî hat rengê xwe, cudahiya xwe, çanda xwe li ser her kevirekî danî, koland. Li her kevirekê çandek, hestek, baweriyek û bedewiyek pêça. Dêr, mizgeft, havra, sînagok, kuçik, ateşgede bi hev re geş bûn.. bajar wekî gerdeniyeke zêr û ziv li sûtiyê girekê hate badan. Bajarê rengîn, taca şaristaniyan Mêrdîn wekî bû dergûşa cudahiyan.. Her cudahiyekê rastiyek, her rastiyê çîrokek. Ji van cudahiyan yek jî Dêra Mor Behnam bû. Werin em çîroka Dêra Mor Behman guhdar bikin.

Dêr li Taxa Şar li Rojavayê Dêra Mor Yûsûf hatiye avakirin. Dema qralê yewnanan Arsus li Mêrdînê serdest bû 7 dêr li Mêrdînê ava kirine. Yek ji van dêran dêra Behnam Saro ye. Tê gotin ku ev dêr hezar û 450 sal beriya niha hatiye avakirin. Dêr li ser 12 stûnên stûr û qewîn hatiye avakirin.

Li ser Dêra Mor Behnam du çîrok têne gotin. Li gorî rîvayetê; vê dêrê navê xwe ji çîroka xwişk û birayên hev Mor Behnam û Saro girtiye. Saro bi nexweşiya cuzzamê ya bêderman dikeve. Behnam xwişka xwe dibe cem Mor Matay ê Ezîz. Piştî demeke nêzîk xwişka Behman Saro rehet dibe. Behnam vê yekê ji bavê xwe Senharîp re dibêje. Senharîpê asûrî ku qralê Mêrdînê ye, li ser vê yekê ji bo ev bûyer belav nebe û kes nebihîze ku kurê wî ji xirîstaniyê bawer kiriye Behnam û Saro dikuje. Li gorî qralê Mêrdînê Suryan Senharîp, ji ber zarokên wî Behnam û Saro ji Matay bawer kirine û bêrûmetî kirine û wan dikuje.

Piştî demekê qral Senharîp ji ber êş û kerba zarokên xwe nexweş dikeve. Li ser nexweşiyê hevsera Walî Senharîp jî wî dibe cem ezîzên xirîstiyana Mor Matay. Ew jî wekî keça xwe Saro rehet dibe. Li ser vê çîrokê, ji bo Behnam û Saro nemir bimînin li ser navê Mor Behnam û Saro Hezar û 450 sal berê li Mêrdînê Dêra Mor Behnamê saz dikin.

Çîroka din jî ser 40 kesan e ku li dijî komkujiya xirîstiyanê derketine. 40 kes têne girtin û îşkenceyê li wan dikin. Împaratorê wê demê Dukius van 40 kesan dibe şer. Dukius beriya ku van 40 xirîstiyanan bibe şer davêje gola cemedê. Li rex gola cemedê jî hemama germ heye.

Lê belê ji van 40 kesan yek li hemberî sermayê xwe nagire û direve hemamê, lê dîsa dimire. 39 kesên din jî di nava gola cemedê de ji serma dimirin. Navê dêrê yê din jî li van 40 xirîstiyanên berxwedêr hatiye kirin. Tê gotin ku hestiyê van 40 şehîdan li Dêra Mor Behnam hatiye veşartin.

Her çiqas dêr ji aliyê suryaniyan ve bi ked û evîneke mezin hatibe avakirin jî, piştî Artukiyên ku esl û feslê wan ne diyar e hatine herêmê serdestî kirine, dest danîne ser hemû nirxên suryaniyan. Artûkiyên bêrehm ku koka xwe ji turkmenan dihatin; ev dêra ku ji bo bîranîna xwişk û bira Saro û Behnam ava bûbû, di sala 1170'an de ji dest suryaniyan girtin û bi zorê kirin mizgeft.



Vê dêrê wekî dibistanê xizmet kiriye. Di sala 1789'an de bi awayekî fermî deriyê dilê xwe ji perwerdeyê re vekiriye. Bi dilekî nizm û ezîz nêzî 150 salî ji bo perwerdeyê malovanî kiriye û zarokên suryaniyan di dilê xwe de vehewandine. Wê demê di asta dibistana bilind de perwerde dida. Heta sala 1928'an wekî dibistanê hate bikaranîn.

Dêr, heta niha sê caran hatiye nûkirin. Di sedsala 12'an, 17'an û 18'an de bi tevahî 3 caran hatiye restorekirin. Dêr ji 3 beşan pêk tê. Beşa îbadetê, beşa rêvebeyiyê û beşa metropolît. Salonên perwerdeyê û xaniyên peyvirdarên dêrê ye.

Beriya ku mirov derbasî dêrê bibe pêwîst e hinekî ber bi kelehê ve bi pêpelokên Merdînê ve hilkişe. Piştî çend pêpelokan, mirov di neqeb û kolaneke kevirên sipî re derbas dibe, deriyekî mezin û kevnare yê bi hesin û mîxên dirêj hatiye kutan, mêvanên xwe pêşwazî dike.

Heta ku mirov ji kolanê xwe digihîne dêrê pewîst e 3 deriyan li pey xwe bihêle. Piştî mirov ji kolanê di dergeyê mezin û awarte ku bi darên gûzê û hesinê stûr hatiye fesilandin derbasî hewşê bû, hewşeke fireh û mînareya naqosê mêvanê xwe pêşwazî dike. Li rojhilatê hewşê qlûb û mînareya naqosê, li bakurê hewşê avahiya dêr û metropolît, li başûrê hewşê jî gulên zer û malên papaz û şamazan mêvanên xwe silav dikin.

Li milê bakur ê hewşê dergeyekî din ku bi heman hunerî hatiye sazkirin, mirovan pêşwazî dike û riya dêrê li pêşiya mirovan vedike. Deriyê sêyem jî dilê dêrê ji mirovan re vedike û bi hezkirin û dilnizmiyeke mezin xêrhatineke germ dide mêvanên xwe.

Avahiya dêrê beriya hemû beşên din hatiye avakirin. Her ku dêr mezin bûye û hatiye nûkirin beşên din li ser dêrê hatine zêdekirin. Salona dêrê ji 5 nefiyan pêk tê û her nefiyek bi deriyekî vedibe hewşê. Ev deriyên salona dêrê jî bi darên gûzê û hesinên Mêrdînê hatine pêçan. Bi mîxên stûr hatine hûnandin û neqişandin. Ev derî di sala 1797'an de ji aliyê Patrîk Matiyûs ve hatine nûkirin. Salona dêrê ku ayîn lê têne kirin hîn bi awayekî awarte zindî maye û ayîn lê têne kirin. Li dîwarên dêrê tabloyên ezîz û rahiban hatine daliqandin.

Li rohilatê dêrê 5 apsîs ango bi awayekî awarte û hunerek mezin hatiye xemilandin. Deriyên mezbahê ku aliyê Qduş Qutşinê diparêze ji darên gûzê ne. Ev deriyên dîrokî û gelek alav û nexşên Qdûş Qutşînê 200 sal beriya niha ji aliyê Patrîkê 3'emîn Petrûs ve hatiye sazkirin. Gelek alavên milê apsîsê ji zîv û hêmanên curbe curpêk tê. Li pişt her apsîsekî ango Qdûş Qutşînekî gudoyek heye. Û li ser van gudoyan pirtûkên pîroz ku bi nivîsa suryanî hatine nivîsandin ji bo xwendinê amade ne.

Ji ber ku dêr hîn bi awayekî zindî ayîn lê tên kirin, hefteyê nêzî 400 suryanî li hev dicivin û bi civatî ayina xwe dikin. Qendîl ji agirê zeytê derdorê xwe ronî dike. Ji ber zindîbûn û geşbûna xwe gelek fîrmo bi rêzê balê dikişînin ser xwe. Ev fîrmoyên ku agir û busmeyan dixin hundir û dûyê agirê wan bi ser civatê ve belav dikin qor bi qor xwe bi ser deriyê Mezbahê ve berdide.

Li milê başûrê dêrê mînareya naqosê ber bi ezman ve bilind dibe û di her wextê ayinê de dengê xwe li beriya Mêrdînê belav dike. Li dêrê li gel ayinê dîsa gelek ders lê têne dîtin. Dêr niha ji cimeta suryaniyan re vekiriye û gelek rastî eleqeyên turîstên derve tê.

# Li Dêrsimê nebateke bitehm û feyde: Sîrên çiyayî

Bêrîvan Karatorak

Dêrsim, bi xwezaya wê ya bedew a wekî xeyalekê di dilê welatiyan de cihê xwe digire. Welatî her havînê ji bo ger û geştê berê xwe didin bajarê di hembêza çiyayên bedew de. Hin kes di nav xwezayê de bêhna xwe vedidin, hin kes jî berê xwe didin xwezaya wê ya dewlemend a ku nebatên cur bi cur lê şîn dibin. De ka werin em di nav çiyayên Dêrsimê de bikevin lêgerîna sîrên çiyayî yên ku tenê li vê herêmê şîn dibin.

Li serê çiyayekî dest pê dike jiyan. Çiyayê bilind dibe dermanê mirovahiyê. Çav têr nabin ji temaşekirina heybeta çiyayan. Dengê çem hênik dike dilê kewandî, dar dibin stargeha mirovan. Her demsalek aramiyeke xweştir tîne bi xwe re. Her bihar destpêkek e, kelecanek e û hilberînek e. Amadekariya demsala herî hilberîner a havînê ye.

Kurdistan xwedî erdnîgariyeke wisa ye ku bi çiya, zozan û çeman rapêçayiye. Xwezaya wê ya dewlemend li her herêmekê bûye wekî tabloyeke herî xweşik a wênexêzan. Welatî her sibeh çavên xwe li bihûştekê vedikin. Dilê wan germ dibe, aram û bextewar dibin.

Li Kurdistanê yek ji bajarên ku bi xwezaya xwe ya dewlemend bi nav û deng bûye bajarê Dêrsimê ye. Bajarê ku di hembêza çiyayan de ye, bi xuşexuşa çemê Munzûrê aram dibe. Bajarê Dêrsimê xwedî xwezayeke ewqasî dewlemend e ku nêzîkî 300 cure nebatên ku tenê li Dêrsimê şîn dibin hene. Yek ji wan nebatan jî sîrên çiyayî ne. Her çi qas li herêmê wekî sîrên çiyayî hatibin nasîn jî ji ber ku tenê li herêma Dêrsimê şîn dibin wekî sîrên Dêrsimê jî tên zanîn.

Sîrên ku gelek feydeyên wan digihin tenduristiya mirovan li quntarên çiyayan hêşîn dibin. Her çiqas di salên dawî de hewldaneke çandiniya wan hebe jî şêniyên herêmê bi piranî wan ji çiyayan kom dikin. Sîrên çiyayî di mehên biharê de zîl didin û heta dawiya meha tebaxê digihin. Sîrên xwedî feydeyên zêde, divê di mehên tebaxê de werin çinîn. Di hundirê gihayê sîran de tovê sîran heye. Wexta ku berî dema xwe werin çinîn ew tovê wan nakeve nav axê û saleke din li heman cihî sîr şîn nabin.



Çinîna sîran a berî demsala xwe ji bo berdewamkirina cureya wan hatiye qedexekirin. Berî dawiya tebaxê welatî bi tu awayî naçin çinîna sîran, li bendê dimînin ku tovê xwe bireşînin û amadekariya sala pêşiya me bikin. Di dawiya meha tebaxê de welatî di kelekela wê havînê de dest bi çinîna sîrên ku tenê li herêmê şîn dibin dikin. Ji ber ku meha tebaxê pir germ e, şêniyên herêmê serê sibehê, bi hilatina rojê re tûrikê xwe diavêjin ser milê xwe û berê xwe didin çiyayan.

Sîrên çiyayî ji ber ku jixweber heşîn dibin hemû ne li cem hev in. Divê mirov demek dirêj pê re derbas bike û lê bigere. Ev yek jî çinîna sîran hinekî zehmet dike. Lê belê ji bo şêniyên herêmê ev ne zehmetiyek e, wekî ger û geşteke li xwezayê ye.

Welatî di lêgerîna sîran de pir baldar tevdigerin. Hêdî hêdî gav bi gav dimeşin û bi baldarî li derdora xwe dinêrin. Dibe ku di binê kevirekî de an jî di nav hin gihayan de sîrek şîn bûbe.

Çinîna sîrên çiyayî ne hêsan e. Ji ber ku sîr di binê axê de ne, ji bo derxistinê hêzek ji wan re divê. Welatî ji ber vê yekê, bi alîkariya dasikekê sîr ji binê erdê derdixin. Piştî ku sîran ji binê erdê derdixin gihayê wan paqij dikin û sîr dikin nav tûrikê li ser milê xwe.

Helbet cudahiyeke sîrên çiyayî heye ji sîrên din. Sîrên ku li hemû deveran şîn dibin xwedî gelek dendik in. Lê belê sîrên çiyayî yên Dêrsimê tenê wekî dendikekê şîn dibin. Libê wê jî ji sîrên din mezintir e. Xwezaya dewlemend xwe bi xwe nû dibe. Bi tena serê xwe tehmên ji hev xweştir û bifeydetir digihîne mirovahiyê. Mirovan ber bi xwe ve dikişîne, dibe qadeke dewlemend a sûdwergirtinê.

Taybetiya ku sîrên çiyayî girîng dike ne tenê guherîna şeklê wan e. Her wiha ji aliyê feydeyên xwe ve jî ji sîrên pirdendikî cudatir in. Bêhna sîrên çiyayî ne gelekî dijwar e. Lê belê tama wan gelekî xweş e. Sîrên çiyayî ji êşa mîdeyê re pir baş tên. Her wiha tê zanîn ku sihetê didin beden û nahêlin mirov zû bi zû bi nexweşiyan bikevin. Antîoksîdana sîrên çiyayî ji ya sîrên din pir zêdetir e. Her wiha feydeyên van sîran digihêje nexweşên tansiyon û nexweşên şekir jî.

Sîrên ku di hênikahiya sibehê de têne çinîn, piştî nîvro li bazarê cihê xwe digirin. Ji ber ku sîr hemû ne li cem hev in, di rojekê de mirov nikare gelek sîran bicivîne. Welatî herî zêde an kîloyekê an jî du kîloyan diçinin.

Sîrên çiyayî hem li herêma Dêrsimê hem jî li bajarên derdorê gelekî bi nav û deng in. Ji ber vê yekê her kes dixwaze ji feydeyên wan sûd wergire. Li bazaran di demeke kin de tên firotin. Ji ber ku sîrên çiyayî tenê li Dêrsimê şîn dibin û ne di nav erdan de tên çandin di salekê de li gor daxwaza mirovan kêm kom dibin. Ji ber vê yekê bihayê sîrên çiyayî ji sîrên din zêdetir e. Lê wexta mirov keda di çinînê de bîne ber çavê xwe bihayê wan li gor keda xwe ne zêde ye.

Xwezaya Dêrsimê li gel dîtbariya xwe ya newaze bi tehmeke cuda xwe digihîne welatiyan. Welatî hem di xwezayê de bêhna xwe vedidin, hem jî ji nebatên xwezayê sûd werdigirin. Sîrên çiyayî yên herêmê bi taybetiyên xwe û bi feydeyên xwe dibe xelekek, tev li taybetiyên Kurdistanê dibe û di nav rengên welat de cihê xwe digire.